# Temenê jiyanê

**Bîranînên Gerîla**

Amedekar

Hamid Dêrik

(Necim Abdulah)

Weşanên Parastina Gel (HPG)

# TEMENÊ JIYANÊ

**Bîranînên Gerîla**

Çapkirin: Adar 2010

Çapxane: Çapxaneya Roj



TEMENÊ JİYANÊ

# DIYARÎ

Ji hêviya jiyana azad û rometa gelan Rêber( APO) re

ji bona pêşeroja hebûna mirovan

pakrewanên azadiyê re

ji bona zarokên agir û rojê

## NAVEROK

TEMENÊ JIYANÊ……………………………....……8

DILÊN BI HEVRE LÊDIDIN…………………….…22

LI BIN RONAHIYA HEYVÊ…………….………23

EFRANDINA JIYANÊ………………….....…......33

GERÎLA Û DEMSAL……………………......…38

PEVÇÛNA JIYAN Û MIRINÊ………………...….43

HER TIŞT FEDAYÎ AZADIYÊ…………...……..…..48

HESTÊN Jİ NÛVE XWE BİLÊV DİKİN………..…..58

GOVENDA SERKEFTINÊ………………..........…65

HENASEYEKÎ AZAD……………………………......79





Vegotin Xebat Botan

pêwîste em didema çalakiyan de pir bi dîqetbin û şiyar bin, ji ber ku cihê dijmin lê disekinê gelek caran derdorê xwe mîm dike, ango dema ku hevalê Sebrî û hevalê Rûbar dikevin nava girde û leşker bi wan nahisi, wê demê bi serbestî di nava gir de digerin û wê demê mîm bi wan de diteqe, dibe ku dema heval bi şiyarî tevbigeriyane, wê demê wê hevalan mîm feriqkiribane, ji ber wê çiqa di dema keşfê de her tişt li ber çavan tê girtin, wê demê dema pêkanîna çalakiyê de jî pêwîste hîn pêtir her tiştê mezin û biçûk li ber çavan were girtin. Hêzê me bi qasî şazdeh hevalbûn, ji ber ku hevalê tevlî çalakiyê bûwîn bi giyanekî can fedayî tevlî çalakiyê bûn û bi israrekî mezin erkê xwe bi cî anîn; lewra hevalan serkeftin bi dest xistin û leşkeran nekarî xwe li ber vîn û mêraniya hevaln bigre. Ev jî vê dide xwiya kirin ku cihekî ku mirov tê de nikaribe çalakiyê li ser dijmin bike nîne, ji ber ku çiqa dijmin ji xwe bawer be jî, helbet cihekî wî yê lawaz wê hebe ku merov lêbide û wî bêxîne, ji ber ku hêzên gerîla weke nêçîrvanane û li her deverî li nêçîra xwe digere, ji ber wê yekê dema hevalê Sebrî keşfa wê qadê dikir wê demê biryara xwe da ku çalekiyê li ser wî girî bike û digot em dikarin li vê derê dijmin bixînin, ji ber wê yekê dem û cihê çalakiyê tiştê herî giringe ji bona serkeftina çalakieyekî, ya diduyan neqandina armencê ye. Çalakî bandorekî xwe yê mezin li ser dijmin jî hebû ji ber wê, heme piştî çalekiyê cihê wan leşkeran hemûan hate guhertin û dijmin xwest ku hakimiyeta xwe li ser vê qadê çêbike, lê vê çalakiyê tirsekî mezin li cem dijmin da çêkirin û êdî nikarîbû oparisyonan li qadê bide meşandin, tenê derdorê xwe diparast. Di dawiyê de em bi riya vê bîranîna xwe sersaxiyê ji malbata herdû hevalan re dixwazin û em sozê didin wan hevalan û hemû şehîdin şoreşê ku emê li ser riya wan bimeşin heyanî gihiştina azadiyê. Cenazê hevalê Rûbar li gundê Zivingê hate veşartin, lê cenazê hevalê Sebrî li Gabarê hevalan ew veşart.





DI ŞÛNA PÊŞGOTINÊ DE

Helbet her tiştê mirov jiyan dike, nikare bîne ser ziman, an jê bi nivîsandinê nikare îfada wê bike, ji ber ku gotin, ango jiyan bi hemû rastiyên xwe û hebûna xwe cîhanekî veşartî ye. Lê belê mirov tenê dikart bi nivîsandinê zora mirinê bibe û her tiştê hatî jiyankirin, ji nûve zindî bike û bi giyan û hest bike. Sal bi sal mirov ji temenê xwe dide vê jiyanê û weke ku deyndarê vê jiyanê be, bi her awayî kar, xebat û tekoşîna xwe ji bo vê jiyanê seferbelik dike, ta ku vê civakê bighîne peravên azadiyê. Lewra her bîrhatinekî ji bîrhatinên ku li van çiyayan û di nava bedena van waran de hatî xêzkirin û xemilandin, xwedî wate û heyînekî bêhampaye û her çiyayekî pirtûkekî veşartiy e, jiyan û rojên ne weke rojan di nava rûprlên xwe de dihewêne. Ji ber vê yekê werin em bi hevre rûpelên van pirtûkan yek bi yek bi hevre biqulibînin û wan serpêhatiyên ku hatî jiyan kirin bi hev re ji nûve jiyan bikin, bi dil, giyan û hestên xwe.
Ji ber vê yekê ez bi hêvî me ku hûnê demekî xweş bi xwendi van serpêhatiyan re derbasbikin û jê sûd werbigrin.





xwe neda û di demekî bi qasî deh xolekan de gir hemû dikeve destê hevalan de. Wê demê dema hevalan li qereqolê jî didan qereqolê jî nidikarî ji wan re alîkariyê verêbike, ji ber wê leşkeran nedikarîn li ber xwe bidin û ji milê din ve jî gelek tiştê di qereqolê de jî hevalan dana ber agir û ew jî şewitîn. Ji xwe pîlanlemeya me di serî de ew bû ku em gir bigrin û qereqolê tacîz bikin û wê bê bandor bikin, ji tu milî ve alîkarî ji leşkerê di girde nehat, heyanî dema ku hevaln hevalê Rûbar anîn û ew li cihekî veşartin û hevalê Sebrî jî ji wê derê xilaskirin û tiştê heyî hevalan ew jî bi xwe re anîn. Wê demê ango piştî sî xolekan heyanî wê demê jî dijmin nedizanî ev çalakî çawe çêbûye ji ber ku di şoqê de mabûn û peyre ji nûve qereqolê li derdorê heyî pêhisiyan ku çalakiyek li wê derê hatiyê kirin, dijmin bi hewan û katûşan erdîngariya wê deverê dana ber agir ji bo ku pêşiya hevalan bigrin, lê wê demê heval ji qadê derketibûn û ji bin hakimiyeta derketibûn, dema wê çalekiyê Payîzbû, û li henek cihan perf ketibû, ji ber wê dijmin texmîn nedikir ku em çalakiyê bikin, wan rojan jî baranekî sivik dibariya, ji ber dem û demsala çalekiyê hîç dijmin texmîn nedikir ku çalakî were kirin. Piştî ku çalakî hate kirin û leşker hatin kuştin wê demê leşkerê di qereqolê de pê dihse ku leşker hatine kuştin, ji ber wê dema wê çalekiyê û sala 2005'ê ji bona me çaxekî giring bû û pêngavekî nûbû, û serkeftîbû, lê ji ber şehadeta hevalê Sebrî û hevalê Rûbar çalakî çiqa serkeftî bû jî lê bandora van wendahiyan li ser me pir giran bû. Ji ber ku pêwîst bû me di vê çalakiyê de wendayî nedaban, dibe ku çalakiyeke din be û henek şert û mercên cudaban, wê demê me tiştek nedigot, ji ber ku di vê çalakiyê de me hesabê du şehîdan nekiribû, şehadeta her du hevalan ji mere wise lê hat, weke ku me ew çalakî nekirî û bandora wan şehadetan gelek li ser hemû hevalan hebû, çiqa ku hevaln gelek çek û kelûpelê leşkeran jî bi xwe re anîbûn lê coşa hevalan ne li cîbû û heval pir li ber herdû hevalandiketin, ji ber wê yekê

cihê xwe, wê demê demjimêr dihate duzdehê şevê, çalakî tam di demjimêr dozdeh û deh xolekan de destpêkir, yekîneya destpêkê ya hevalê Sebrî wan diçe, hevalek di wê yekîneyê de navê wî Rûbarbû, ew xwe jî eslê xwe ji Bismilê bû, wê demê hevalê Rûbar bêl mîmê dike, ji ber ku li ber kozika leşkeran mîm hebûn, wê demê hevalê Rûbar di cih de şehîd dikeve, hevalê Sebrî jî birîndar dibe. Hevalê Sebrî bi eslê xwe ji bajarê Qamişlobû ji mala Gulobû, birîna wî pir giran bû, lê hevalê Sebrî dema ku birîndar jî dikeve hîn jî bêtêl di destê wî de bû û pê diaxivî û me bi hevre sohbetdikit. Di wê navberê de me jê birskir li ser rewşa wî, wê demê gote me: Xema nekşînin rewşa min başe, tiştek ji min nehatiye, lê me peyre feriq kir ku birîna wî pir girana lê naxwaze ji mere bibêje, ji bo ku bandora wê li ser hevalan çênebe, ji ber wê dema ku heval diçin ku wî bînin, heval dikevin nava leşkerê di girde, tenê bi qasî deh xolekan leşkerê heyî li ber xwe dan û jê şûnde gir hemû kete destê hevalan de, wê demê dema ku heval dixwazin hevalê Sebrî ji wê derê xilasbikin; ji hevalanre dibêje rewşa min başe biçin wan çekê leşkerê kuştî hemûyan kom bikin, wê demê hevalan deh – dozdeh çek bi xwere anîbûn û gelek kelûpelê leşkerann jî bi xwere anîbûn. Lê ji ber ku heval dixwazin hevalê Sebrî xilas bikin, lewra zêde guh nadin çekê mayî û heval radibin hevalê Sebrî tînin, wê demê di rêde dema ku heval, hevalê Sebrî tînin wê gavê û ji berî ku bighêjin cihê ku em jê veqetiyan bi rêde şehîd dikeve. Bi rastî me di destpêka çalakiyê de tucaran texmînê şehadetê hevaln nedikir û me wê demê jî digot: Bibê jî dibe ku hevalek şehîd bikeve, ew jî me digot: Dema ku şaşîtî çêbibin, û ji milekî din ve me digot: Dibe ku henek leşkerê di sengeran de li ber xwe bidin wê demê dibe ku em birîndar an jê şehîdan bidin, ew jî texmînin pir lawazbûn, ji ber ku me dizanî ku leşker li ber xwe nadin, ji xwe dema ku heval ketin gir de û ji dûrbûna narinceyan ve li leşgeran didin, lê dijmin hîc li ber





# TEMENÊ JIYANÊ

Li ber her kevirekî û di bin siya her darekî de çîrokekî veşartî li dare û di hindirlê her dîmenekî ji vê jiyana ku ji her milî ve bi hêvî, vîn û evînê tijiye, tovê hebûnê û azaiyê ji nûve bi temenekî dagirtî û xwedî wate xwe bi lêv dike.

Kurmê darê dîse dixwest darê bîne xwarê û dawiya jiyanê bîne, lê weke ku dibêjin: Ew ware lê ne ew Buhare. Sal 1997'tan bû di serî de êrîşên dijmin yê ku bi armenca tunekirinê bi ser mede dihatin, li ser vî bingehî mirov dikare bibêje ku sala 1997'an li ser vî bingehî salekî gerim bû û dagirtî şer û pevçûnin giran bû. Weke rêber APO jî gotî: Birastî sala fînalêbû ji hemû milê xwe ve û mirov dikarê vê salê wêke salekî bi hereket û tevger bihesibîne, hem ji milê meve û hem ji milê dijmin ve jî. Di vê salê de me haziriyê çalakiya Bamernê dikir û me çalakiya xwe bi serêxist. Ji ber vê yekê ez dixwazim li ser vê çalekiyê henek bûyerên ku têde hatine jiyankirin ji were bînim ser ziman. Di sala 1997'an de û piştî hemla 14 dehê Gulanê, hêzên leşkerê tirkan û bi desteka hêzên xiyanetkar yên partiyên Başurê mezin, şer û pevçûnên pir mezin di navbera me û wan hêzan de rûdan. Ji ber vê yekê me jî bi hemû hêza xwe li ber xwe di da û li beramberî hemû hêzên heyî û teknîka heyî me jî li her derî û di her eniyê de tekoşînekî bêhampa dida meşandin û armenca me ewbû ku em dijmin û hêzên nûkerê hevpariya wan dike ji her milî ve bê bandor bikin, ji ber wê yekê armencê me ji xwere danîn mezin bûn ya yekê ew bû ku em xeta Bamernê heyanî Amediyê ji destê dijminan derxin û

qederê şer bêxin destê xwe de. Li ser vî esasî amedekariyê çalakiyekî li ser bajarê Bamernê dihate çêkirin, ji ber ku bajarê Bamernê xwedî cihekî navendî bû, hem ji milê bicihbûna leşkerî ve û hem ji milê kombûna gel ve, ji ber vê giringiyêa me di serî de dayî nîşan dan, ji ber wê me bajarê Bamernê ji xwere kire armenca yekemîn, armenca çalakiyê ew bû ku em bajarê Bamernê bi tevahî têxin destê xwe de. Li ser vî bingehî me her tişt danî li ber cavê xwe û heyanî hefteyekî me dorbêçkirina bajêr jî danî bêşiya çavê xwe, ji bo girtina bajêr, bi vî awayî keşfa çalakiyê hate kirin û haziriyê çalakiyê hatin amide kirin û hemû hevalên ku cihê xwe di rêveberiyê de digirtin di keşfa çalekiyê de cihê xwe girtin û ji hermilî ve keşf, nexşe û pîlanlemeya çalakiyê hate kirin. Hêzên ku wê tevlî çalakiyê bibin bi qasî sê tabûran bûn, di çalakiyê de cihê herî giring sê cihbûn, yek jê sirtê ku ewlekariya bajêr dikir, ji ber wê pêwîstbû ji berî her tiştî em wî girî bêxin destê xwe, cidayî wê du cihê ewlekariyê yê din jî di nava bajêrde hebûn ew jî du kelhên ku ji dema hukmê dewleta behes ve mabûn û hêzên pêşmerg ew bi kartanîn. Ji ber wê yekê weke me di destpêkê de dayî xwiyakirin, sitandina lûtkeyê ku parstina bajêr dike û herdu kelhên nîva bajêr, ev hersê cihên giring ewbûn armencê me yê bingehîn. Bi qasî du tabûr hêzên me hem milê çepê yê bajêr û milê rastê yê bajêr dorpêç kirin, weke hêzên alîkar ji hêzên êrîşêre ji milekî ve û hem weke hêzên ku dikemînê de sekinî, ji bo astengkirina hêzên ku ji derve werin û bixwazin mudaxelaya bajêr bikin. Em biqasî bîlûkek heval jî yê mayî, erkê me ew bû, weke sê yekîneyan êrîş bibin ser wan cihê bingehîn yê ku bajêr diparêzin û piştî ketina wan hersê cihê giring û ketina bajêr, wê demê hevalê ku di kemînê de jî sekinîne wê destekê bidin van yekîneyên êrîşê û ew jî wê bikevin nava bajêr û emê wise bajar têxin destê xwe. Nexşeya me ya çalakiyê ji bo bidest xistina bajêr ev bû.





ezê bikevim ykîneya êrîşê yan jî ez nahêlim ku ev çalakî were kirin, hevalê Sebrî wê demê ji hevalan re digot ev çalakî min keşfa wê kiriye û pêwîste ez cihê xwe di yekîneya êrîşê de bigirim, ji ber ku ez her derî nasdikim û ezê encamekî baş ji vê çalakiyê bigrim. Gelek hevalê din jî pêşniyarê wan hebûn ku hevalê sebrî nekevê yekîneya êrîşê de, lê hevalê Sebrî xwe aciz kir û digot: Çi bi be pêwîste ez bikevim vê çalakiyê. Ji ber wê yekê çiqa ku bê dilê me bû jê, lê ji ber israra hevalê Sebrî em rabûn û me hevalê Sebrî tevlî vê çalakiyê kir, mebesta me ewbû ku me nedixwest hevalê Sebrî tevlî yekîneya êrîşê bibe, ji ber ku ji malbata wan gelek şehîd hene û pêwîste ji bona vê malbata welatparêz jî mabe em vî hevalî biparêzin, lê wî jî tim dixwest tevlî çalakiyê bibe, ji ber wê di dawiyê de hevalan gotin: Heger wiseye û ji neçaeî bile hevalê Sebrî cihê xwe di yekîneya êrîşê de bigre. Hevalê Sebrî jî hevalekî wise xwîn gerim û heyanî stekî ecelecîbû, lê ji milê din ve jî hevalekî bi coş û heyecan bû û tim ken li ser lêva bû. Di destpêkê de me navê hevalan di nava hevalê rêveberiyê de xwandin û peyre jî me navê hevalê ku bikevin çalakiyê li pêşiya hemû hevalan xwandin, herdû giropê biçin ser qereqolê û yê kemeînê hatin belîkirin û herçar yekîneyên biçin ser gir hatin belîkirin. Me di civînê de bi hemû hevalê çalekiyê re guftugo çêkir û piştî wê me bi yekîneyên çalekiyê re yek bi yek civîn çêkir, li ser hemû xalê girêdayî çalakiyê em rawestiyan û cidayî wê li ser axê û li pêşiya hemû hevalan me pîlanlemeya çalekiyê ji hevalan re ravakir, ango me kiroka wê ji hevalan re da xwiyakirin, ji bo ku hemû heval bikevin di wê soretê de û rastiya çalakiyê heyanî astekî were têgihiştin. Piştî wê ji ber ku derfet hebû hemû hevalan çûn û cihê xwe dîtin û keşfa wê kirin, ji ber wê yekê her komekî ji cihê xwe memnûnbû û bi hevre hemû riyên çiwîna ser hedefê hatin naskirin. Çalakiya me çalakiyekî wisa bû me tu texmînê wendayiyan nedanîbûn ber çavan, dema ku her kes gihişte

evînê dibîne û bi hemû hestên xwe hîs dike; ji ber ku li van waran ne roj weke rojane derbas dibe û ne şev weke şevan tên û diçin, her tişt wata xwe ji nû ve li van çiyayan digre û bi heskirin û evîna giyanê zarokên agir û rojê xwe bi deng û reng dike. Ji ber vê yekê dema ku behsa jiyana Gerîla tê kirin wê demê mêranî, fedayîbûn û vîna azad tê bêrîya mirovan. Ratiya jiyana gerîla bi evsane û destanên jiyanî dagirtîne. Ji ber ku jiyan li van xakan xweşikbûn û rastiya xwe ji nû ve bilêv dike.

Sal 2005'ê, cih qada Gabarê û dawiya meha dehabn dikete meha yazdehan, me wê demê xwest em çalakiyekî li gabarê bikin, cihê çalaiyê jî girê Zivingê bû, çalakî bi xwe ji milê hevalê Sebrî Gulove hatibû keşivkirin û hazirkirin, ewî hevalî gelek cihên din jî keşifkiribûn lê biryara xwe da û ji mere got emê li ser vî girî çalakiyê bikin; ji berî wê jî gelek çalakiyên din jî di wê qadê hatibûn kirin, lê ji bona ku em bikaribin di hemleya peyîzê de bibin bersiv pêwîste em çend çalakiyan bikin, ji ber wê yekê hevalan ji berî niha gelek caran li wî girî dabûn, lê nekarîbûn bidestbêxin. Ji bona çalakiyê du qolên êrîşê hatin derxistin û du teqwiyê wan jî hatin derxistin. Ev çalakiya hevalê Sebrî keşva wê kirî gelek caran me hevalê rêberiyê jî keşva wê kiribû, ji ber wê yekê hemû heval xwedî hemfikir bûn ku vê çalakiyê bi rê ve bimeşînin, cihê ku heval têre biçin ser gir di navbera gir û qereqolê de ye, ji ber wê yekê bi qasê şazdeh heval ketin qolê êrîşê û teqwiyê, cudayî hevalê di kemînê de cihê xwe girtîn li derdorî qereqolê; başqeyî wê du yekîneyên din jî li ser qereqolê tacîzê bikin, komekî din ji hevalan di navbera qereqolê û girde cihê xwe digirtin, ji bo ku dijmin pêşiya hevalan qutneke, du komê din jî li ser gir wê êrîşê bikin. Ji ber wê yekê rêveberiya Gabarê hemû hazir bû ji bona pîlan kirina vê çalakiyê, wê demê me nedixwest em hevalê Sebrî têxin yekîneya êrîşê, lê hevalê Sebrî çiqa me kir û nedikir me nikarî em pêşiya biryara wî bigrin û ji hevalan re got: Yan





Bi vî awayî bingehê pîlanlemeya çalakiyê hate hazirkirin, lê ev çalakî ji milê şêwazê xwe ve, ji çalekiyên hatine meşandin henekî cuda tir bû, ji ber ku em fêrî çalakiyên bi şev bûbûn, lê vê carê me pîlankir ku emê bi roj biçin ser hedefê û emê bi roj êrîşî dijmin bikin. Ji ber vê yekê em gelek heval hîn fêrî vî şêweyê çalakiyê roj nebûbûn û ev çalakî neçalekiyekî weke wan çalakiyê ku heyanî neha me dane meşandin. Dibe ku me gelek çalakiyên biçûk pêkanîbin lê ev cara yekemîn bû ku em çalakiyeke bi rengekî mezin û bi roj dikin, lewma ji mere tiştekî nûbû. Sedemê ku me xwest em vê çalakiya xwe bi roj bikin, ji ber ku di dema keşfê de hate belîkirin ku her milê lûtke bi Mayînan hatiye çandin û çiwîna ser lûtke bi şev pir bi rîs û tehlike ye. Lê belê ziraviyê wê yê din jî hebûn, ew jî ew bû ku ev mayînê ku hatine bi cih kirin hemû li gorî texmînê êrîşekî bi şev hatibûn bi cih kirin. Sedemê wê ew bû ku pêşmerge bi roj li derdorê xwe her tim dinava liv û lebatê de bûn û ji ber ku bi serbestî tevbigerin serê têlê mayînan hemû ji derve hiştibûn. Dema ku ev hemû ziraviyên leşkerî di dema keşfê de hetin dîtin, wê demê êrîşkirina bi roj baştir hate dîtin. Li ser vî bingehî haziriyê çalakiyê hatin kirin û hemû hêzê ku wê bikeve çalakiyê hatin komkirin. Li gorî vê, hemû şervan û fermandarên ku wê cihê xwe di çalakiyê de bigrin yek bi yek cihê çalakiyê dîtin. Çalakî ji milê keşf, pîlanleme û belavkirina hevalan de hazir bû û hêdî heval diketin nava liv û hereketê de. Wê demê yekîneya ku me cihê xwe tê de digirt di bin fermandariya hevalê Medenî û hevalê Dijwarê Erkendî de bû. Ji ber wê yekê em bi wesîleya vê rojê van herdû hevalan bibîrtînin û li beramberî qehremaniya wan em bejna xwe ditewîne. Armenca yekîneya me standina lûtkeyê ku paristina bajêr dikir bû.
Lê pêwîst bû ku em heyanî cihekî bi şev biçin û xwe li cihekî nêzî cihê çalakiyê veşêrin û heyanî ku hemû yekîneyên me yên din cihê xwe bigrin wê demê emê

çalakiya xwe destpê bikin. Her milê erdîngariya heyî nehatibû dîtin, ji ber ku em li gorî keşfa hatî kirin ketin nava hereketê de, lê li gorî tecribeyên me yê gerîlatiyê me cihek ji xwere dît ku em lê xwe bi cih bikin heyanî bi be sehar. Lê didema çiwînê de me gelek tengasî kişandin, ji ber ku cihê ku em lê bisekinin hemû cihê rezê gundiyan bû û gelek nêzî cihê ku pêşmerge lê bi cih dibin bû û cihê çiwîn û hatina gundiyan bû. Ji ber ku me nikarî em cihekî ewletir bibînin, lewma em di nava rezan de bicih bûn, hêzê bêşmergeyan jî di ser serê me re bûn. Ji ber wê yekê şaşîtiyekî herî piçûk wê bi be sersebebê ku çalakiya me were betalkirin. Ji ber wê yekê bi tevdîrin herî zirav di nava rezan de em bi cih bûn. Lê seknandina me ya nava rezan de, hişt ku dayika Fatê li me rast were. Em bi vî ewayî di nava rezan de bi cih bûn û bi avêtina zereqa rojêre ciwanekî gundiyan bi tevî kera xwe, ji bo kezaxtina rezan berê xwe da me û berû me hat, di wê demê de me ne karî bû em dengê xwe derxînin yan jê, ji cihê xwe derkevin, tenê me dikarîbû em bimînin li bendê heyanî ku bighêje cem me û em wî bigrin cem xwe, li ser vî bingehî me dengê xwe dernexist heyanî ku gihişte me û me ew li cem xwe girt û me jêre nedenê girtina wî li cem xwe jî ravekir û me jêre vegot ku emê te heyanî demekî bigrin cem xwe. Di wê navberê de birayê wî yê biçûk jî li pey wî hat, ji bo bighêje birayê xwe. Lê dema ku gihişte rex me, me ew jî girte cem xwe. Demek di sere derbasbû lê çiwîn û hatina gundiyan nerawestiya. ji ber wê hijmarekî zêde û bi taybet hemû jin bûn dane pey hev û berû me û hatin. Di wê navberê de em mecbûr man ku em nêzî deh kesan bigrin cem xwe heyanî em çalakiya xwe pêkbînin. Di wê navberê de û piştî ku henekî nêzîkî me bûbû jinekî ixtiyar ku em dereng pê hisiyan û me hew dît ku wê ji nişkave gihişte cem me, me xwest em wê jî bigrin cem xwe. Jinekî temenê xwe mezin bû û te tayekî reş di nava pora serê wê de nedidît, me diserî de weke jinekî temen mezin û ixtiyar girte dest, lê piştî ku me





Vegotin Rûbar Silûpî

## HENASEYEKÎ AZAD

Hesreta her mirovekî azadîxwaze ku cihê xwe di nava refê gerîla de bigre û eşqa her evîndarekî ewe ku henaseyekî ji wan henaseyên azadiyê bikşîne cerg û hinavê xwe yê ku ji bona serweriya vî welatî û vê xakê dîn û har bûye.
Erê dema ku pehsa jiyana Gerîla tê kirin, ew bazên ku bi dil, hest û vîna xwe xweşikbûna van waran dixemilînin û rastiya jiyaneke nipû nû ji nûve dihûnînin û diefirînin. Wê demê her tişt ji nûve li van qadan xwe bi nav dike û weke zarokekî ji nûve cavê xwe li jiyanê diveke, mirov xweşikbûn û rastiya

hevalê Eyûb çirûk derdikevin, tiştekî wisa ticaran mejiyê mirovan nagire ji ber ku hemû fîşek nûbûn û di ber çavan re hatibûn derbaskirin. Ji ber rewşa hevlê Eyûb dikeviyê yê leşker coş digre û her dema ku fîşekê hevalê Eyûb çirûk derdikevin di wê demê de yê leşker guleyan li hevalê Eyûb direşîne, wê demê hevalê Eyûb ji bo ku xwe biparêze li derdora sengerê dizivire, lê dema ku çarê nabîne dest tavêje nariceyekî û ji xwere dibêje ancax dawiya vî leşkerî wise were. Dema ku hevalê Eyûb narinceyê tavêje wî leşkerî, wê demê narince di nava piyê wî de diteqê û ew dimre, demê hevalê Eyûb diçe ser zenazê wî û çeka wî tîne, coş û heyecaneke mezin digre. Ji ber ku dema tu beramberî çekekî pir dijwar li hemberî te tê şoxlandin xwediyê wê çekê bikujê û çaka wî bi destbêxê, serkeftinkî pir mezin e. Ji ber ku leşkerê din di xewê de hatin kuştin, lê ew bi zindî hate kuştin û weke min ji berî neha anî ser ziman rolê wan hevalan jî, ji yê me pêtirbû û pêtir erkê xwe bi cih anîn , wê yekîneyê çadirek dido jî şewitan din. Bi vê serkeftinê weke min di serî de dayî xwiyakirin û weke rêber APO jî tîne ser ziman: "Şer ji berî şer tê qezenckirin." Ji ber vê yekê ev çalakiya me ji berî ku em bikevinê me di fikir û biryarê xwe de qezenckiri bû, wexta me li çavê hev dimeyîzand, wê demê nîşana serkeftinê baş têde xwiya dikir. Bi rastî me bi riya vê çalakiya xwe rihekî nû di Tendûrekê de da avakirin, ew rihê ku êdî bikaribe çalak bibe û bihêle ku leşkerê heyî çokên wan bilerizin ji ber vî rihê ku bi hemû hevalên heyî re hate parve kirin û ji hemû hevalanre bû mal, ji ber ku her hevalekî erkê xwe bi cih anîn û gelek hevalê ku cihê xwe di vê çalakiyê de girbûn li cihên din û bi rengekî qehremanî tevlî kerwanê şehîdê bê mirin bûn. Ji ber wê em bi wesîleya vê çalekiyê van hevalan bibîrtînim û soza bilinkirina tekoşîna xebatê li ser şopa wan didin.





dayîka Fatê girte cem xwe û em pêre ketin nava dan û standinê, wê demê rastiya dayîka Fatê derkete holê û weke me texmîn dikir ne wisebû, ji ber ku bi hatin û nehatina xwe re ji me pirsî û got: Kurê min ezê ji we tiştekî bipirsim, hûn bêaqil bûne ku hûn hatine li cihekî wise bi tehlike sekinî ne, ma qet hûn bi ewlekariya xwe nahizirin û we cime xwe daye naverastekî ku hewqa nêzî pêşmerga û hûn li vêderê bicihbûn e; yan jê hûn amedekariya xwe ji bo tiştin din dikin. Ji ber ku berpisyarê me yê yekîneyê, hevalê Medenî bû ji derveyî wî hevalî tu kesî bersiva wê ne di da. Wê gavê hevalê Medenî, bersiva wê da û jêre got: Em ji aliyê Gare ve tên û me xwest ku em xwe bighînin qada Metîna, lê ji ber ku wextê me têrê nekir û hevalê me tev westiya bûn, em neçarman ku em xwe li vê derê veşêrin heyanî bibe êvar da ku em rêwîtiya xwe bi domînin. Lê bi gotina hevalê Medenî dayîka Fatê nehate lêbandin û li hevalê Medenî zivirî û jêre vegot: Kurê min hîn hûn nizanin derewan jî bikin, diyare ku derew li we nayên. Ez jinekî xeşîm nînim û rastiya şer jî dizanim û tê digihêjim ku şer çawe tê meşandin, hûn ji çi Gara û mara nehatine vêderê û hûn hatine vê derê ji bo ku çalakiyê bikin, lê ev tişt me eleqedar nake û ez tenê ji were serkeftinê dixwazim. Bi vî awayî naskirina me û dayîka Fatê hêdî hêdî destpêkir û her ku danûstandin germbû, me dît ku dayîka Fatê ne dayîkekî heme ji rêzê ye; lê belê dayîkekî ku di nava rastiya şer de pijiya ye û gelek caran pêşmergê birîndar li cem xwe derman kirine û gelek caran li cem xwe hewan dine, ango jiyan û rastia Başurê Kurdistanê naskirî ye, lewra baş dihate xwiyakirin ku dayîka Fatê temenê xwe hemû dagirtî dagirtî jiyankiriy e; dayîkekî ku gelek caran di nava eşîreyan de aşîtî û levhatin pêkanîne. Di nava danûstandinên ku di navbera me de derbasbûn, dayîka Fatê ji mere digot: Nexşeya weya çiwîna ser armencê çine û herdem pirsiyarên leşkerî ji me dikirin û bi her pirsek ji pirsên ku dayîka Fatê ji me pirs dikir hîn pêtir bala me

dikşan de li ser xwe, ji ber ku pirsên wê ne weke pirsê jinên gundiyan bûn. Hemû pirsê wê leşkerî bûn û hemû pirsên ku dikirin girêdayî çalakiya ku emê bikin bûn û girêdayî rê û rêbazên ku em têre biçin ser sengerê nûkeran bûn. Li ser vî bingehî dayka Fatê weke hostayekî şer bi mere di axivî, Ji ber wê ez tucaran ji bîr nakim, dema ku dayîka Fatê ji mere digot: Kurê min yê dihêle ku şer pêşbikeve û yê kû şer dike şer, mafdariya rexekiy e. ji ber ku di hemû şeran de, milekî mafdar heye û milek jê jî neheq hey e. Eger ku şer ne wise be, ev tê wê watê ku ev şer şerekî kore û şerekî ku pêwîste newê kirin e û eger bi serbikeve jî, şerekî ku tu wata xwe nîne û ji mere digot: Eger ku hûn bawer dikin ku hûn mafdarin û hûn rastin, ji vê yekê bawer bin û hûnê di wê demê de bi serbikevin. Ji bo me şîroveyên dayîka Fatê weke nirxandinê çalakiyê bûn û hêdî hêdî dayika Fatê weke fermandarekî me cihê xwe di nava me de digirt, ji ber ku her gotinên wê weke perwerdeyekî bûn ji bo me. Çiqasî ku hevalan bersivên girover didane dayika Fatê û nedixwestin rastiya meseleyê jêre bibêjin lê dayika Fatê bi gotinê hevalan yeqîn nedikirin û her ku diçû mijara danûstandinê kûrtir dikir û diket e nava hunerê şer de. Bi rastî ez weke kesayetekî, gelek pê bandor bûm, ne ez tenê jî hemû hevalên bi mere gelekî pê bandor bûn, ji ber ku hemû heval matmayî hiştibûn, wê gavê tenê tiştê me dikarî bû em bikin em bikenin û li hev meyze bikin. Tiştê herî balkêş ew bû ku dayika Fatê tiştê ku tanî ser ziman, bi riya danûsitandinekî jiyanî tanî ziman û bi şêwazekî ku herkes fêmbike dida xwiyakirin. Cidayê wê henek hevalê keç jî di yekîneya me de hebû; ji ber wê danûstandinê wê bi hevalê keçre jî çêdibû, dîse nêzîkatiyê wê yên ji jinêre jî balkêşbûn û ji hevalê keç dipirsî hûn heyanî çi astê dikarin bi hevalan re bibin alîkar û hûn şerkerin yan na, hûn vî karî dikarin bikin yan na, we ji bo vî karî biryarekî xwe yê rast da ye. We li ser çi astî destê xwe avêtiy e vî karî û herwh… pirsên wise balkêş ji hevalê





radigihand, Opîsek hat û li nêzî cihê em lê disekinîn ket, bi qasî pênc gavan dûrî me ket lê Obîs neteqiya, di wê navberê de hevalê Sebrî gihişte me û gek tengbûbû û ji mere got me navendekî leşkerî ya dijmin xist û me serkeftin bi dest xist, lê hûn dixwazin bi kêmasiyekî xwe yê biçûk wendayiyan bidin û serkreftina me valederxin, ji ber wê ji mere got pêwîste em ji vê derê derkevin, me hisabê wê nekiribû ku ew cihê em lê sekinîne cihê sehrincê avê bû û hemû sehrincê heyî armencin ji bo lêdana dijmin, ji ber ku dizanin emê li ser kombibin. Di çalakiya me pêkanî de, me tenê di wê xalê de şaşîtî kir, dema em gihiştin cihekî saxlem, wê demê hevalê Sebrê gazî me tevan kir û got de vêce werin em serkeftina xwe li vê derê bi hevre pîrozbikin. Birastî em pir kêfxweşin ji ber ku me tola hevalê xwe rakir û me pêngava 15 de yê Tebaxê pîrozkir. Çiqas xweşiya çalakiyekî bi serkeftî di lêdana wê debe, ya diduyan xweşiya wê di dema kombûn, suhbetên û pîrozbayiya serkeftina çalakiyêne. Ji ber wê ez dixwazin çîroka serkeftina hevalê xwe yê din bi were parve bikim. Hevalê me yê din jî eyîn weke me ew jî dikevin tepe de, lê leşkerê di sengerê de heyî yek şiyare lê yê din hemû heval wan di xew de digrin û wan hevalan jî weke me lêdan û gelk leşker di nava kîsxewan de hatin kuştin û henek leşkeran xwe di ûçrimande avêtibûn û miribûn, dema ku çalakî destpêkir gelek hevalê teqwiyê xwe ji bîr kiribûn û ew jî bi hevalê êrîşêre ketibûn tepe de, yek ji van hevala Bêrîvan bû, hevalê Eyûb digot min narinceya yekê avête sengerê de û min dest bi şuxlandina qilêşê dikir wê demê min dît ku hevala Bêrîvan li ber kêleka min da tilîliyan, hevalê Eyûb: Got wê demê min jêre got bizivire mane tu teqwiyeyî, lê wê li min ziviran û got êdî kes nikare min bigre û pêwîstî bi teqwiyê nîne bile hevalê teqwiyê jî bikevin tepe û emê bihevre alîkariyê bikin. Di wê navberê de leşkerekî ji kîsxewê derdikeve û dest bi şer dike, ew û hevalê Eyûb bi hevre dikevin pevçûnê, tişta herî sosret nêzî deh guleyê

wê demê me hemû tiştê me jî ser leşkeran rakirî hilda û em bi şûn ve vekişiyan. Di wê navberê de yekîneya meya paristinê kete dewrê, ji ber ku ewê paristina hevalê ku bişûn de vedikişin bikin. Piştî em bi şûn ve vekişiyan wan ji nûve bi birînên xwe hisiyan, ji kuştina leşkeran û rakirina çekan û şewitan dina çadiran û herwh..

Wê demê bi riya Bêtêlê agahî dane derdorê xwe ji bo ku bi riya teknîkê me têxin zoriyê, teknîkekî pir giran kete dewrê, heme heme hemû qereqolên milê Diyadînê û heyanî sînorê Doxobeyazî dê, topê Obîsan dihatin şixulandin. Wise lêkirin te digot ka ezman agir dibarîne û Hilikobter jî ketin dewrê. Ev tişt jî me di serî de hisabê wê kiribû û me dizanî di dema vekişan dinêde wê agir bibarê, ji ber wê li hemberî vî agirî paristin giring bû, em di cihê xwe de sekinîn heyanî demekî û heyanî ku barîna Obîsan kêmbû. Di wê navberê de û dema ku me xwe gihan de saxlemiyê, me ji yekîneya paristinêre gotina veşartî ya vekişandinê da, ji ber ku gelek teknîk li ser wan dişoxolî û ji xwe me xwe gihandibû saxlemiyê. Me sê cih belî kiribûn ku em têde hevdû bibînin, bi rengê ku ya yekê nebû ya diduyan, ya diduyan nebû, ya sisêyan. Ji ber ku em hemû di cihê yekê de gihiştin hev, ji ber wê pêwîstî bi cihê diduyan û yê sisiyan nebû. Em herdû qolên êrîşê û qolekî paristinê gihiştin hevdû lê hîn hevalê Sebrî negihiştiye me, me heycana serkeftinê û çîrokên dema çiwîna meya li ser dijmin bihevre par dikirin, em wise kêfxweş bûn bi ser keftine ku me pêkanî û hevalê me yê din jî wise, wan jî gihiştin me û wanjî Megewîcek û du Gewîc û çend kîsxewê leşkeran jî bi xwere anîbûn. Ji ber wê hêjabû ku em serkeftina çalekiyê bi hevre pîroz bikin, şaşîtiya me kirî pêwîst bû em li wêderê nemabana lê şaşîtî bû me peyre ev yek ferq kir, di dema çiwînê de, me ji bo her ihtîmalî çend şaşal şerbet bi xwere biribû, ji ber wê me şerbeta xwe vexwar. Di wê navbera ku me tê de rewşa xwe ji hevre





keç dikirn. Yan ji wan re digot hûn jinin hincetê we çine we dest bi vî karî kiriy e. Hevalê keç jî li ser bingehê Felsefe û rastiya jiyana PKK'ê bersiva dayîka Fatê didan. Lê dayîka Fatê weke feylesûfekî, her gav û bi pirsekî nû dikete dewrê û her pirsa ku ji hevalan dikir piştî bersiva hevaln dida wê, bersivekî wê xwe jî hebû. Nimûne ji mere digot: Lûtke wê li pêşiya we ye û ez dizanim hûnê biçin ser lûtke; lê dema ku hûn êrîşî ser vî lûtkeyî bikin hûnê bi çi riyê biçin ser lûtke, lê hevalan digot dayîka Fatê tiştekî wise nîne, me ji tere got, em ji Gara hatine, em rêwîne û emê biçin, lê dayîkê li me dizivirane û digot: Na na dev ji wan tiştan berdin, li min binêrin û guhdarî dayîka xwe bikin, binêrin ha li wêdera han şikêrek heye û ji mere bi riya destê xwe tepê pêşmergeyan nîşan dida û dewam dikir pêwîste henek hevalê we bi riya dêrbûnê li we miqatebin û ji mere digot: Ger hûn dixwazin çalakiya we bi serkeftî be, li gorî min hûn di dema firavînê de biçin ser wan hûnê encamekî baş ji çalakiya xwe bigrin, ji ber ku pêşmerge di dema firavînê de pir dev ji xwe berdidin û li derdorê xwe miqate nabin. Bi vî awayî dayîka Fatê bandorekî pir mezin li ser hemû hevalê yekîneyê dikir, me tirsekî wise jiyan dikir, emê ewqas hevalan bê ku çalakî betalbibe li vê derê bigrin. Çend hevalê jin û çend hevalê zilam li vê derê kom bûne nêzîkî deh- pazdeh heval bûn, di nava rezekî de û li cihekî wise nexweş de ku mirov tê de nikarin xwe biparêzin, dema ku ew fikar û gomanên wê me jiyan dikirin û me ji xwere digot wê çalakî deşifrebib e. Lê dayîka Fatê hîç weke ku ne di wê hewayê de be û em bixazin û nexwazin jî em bi xwere berû hewayekî din dibirin. Di herî dawiyê de jî di xala em tê de tengav dibûn jî, yê ku em xilaskirin jî dîse dayîka Fatê bû. Ji ber ku dayîka ciwanê me behsêkirî yê ku di destpêkê de hatî, ew dayîk ji ber ku demekî dirêj bû nêzî çend demjimêran bû me kurê wê li cem xwe girtibû, dayîka wî li pey wî hatibû; lê tişta balkêş ew bû ku dayîka wî û weke ku dibêjin dayîk xwedî hîsekî kûrin û bi

zarokê xwe dihisin, hîs dikin û sehdikin û te digot sankî dizanî bû ku kurê wê tiştek pêhatiy ye. Ji ber wê li dûrî me rawestiya bû û dikire qîre qîr û her digot kezeb delalê min Abdulahê mino kurê min tu li kûrî, cihê ku dayîk lê sekinî heme bêje li cem pêşmergan bû, navbera wê û pêşmegeyan kêmbû û ji me dûrbû, ne di cihekî wise de bû ku em gazî wê bikin, an jê bi rêk û rêbazekî bînin gel xwe, dema qîr qîr û hewarê wê dayîkê zêde bûn, fikarekî wise bi mere çêbû û mi ji xwere got: Ev heneke din bike qîre qîr, em bi xwazin û nxwazin jî ewê pêşmerge bi me bihsin. Bi taybet û di dema herî xeternak de, dayîka Fatê ji birîna mere dibû derman. Baş tê bîra min dema ken li ser lêvabû û her berdewam dikenî, di wê navberê de wise li me temaşe dikir û careke din bi serê lêvan keniye, weke ku pêçarebûna me bibîne û bi gotinê xwe yê anîne ser ziman îfada vê tiştê dikir û ji mere digot: Kurê min, zêde pêve mijûl nebin û vale vale nehizirin, ew dayîke henek tişt sehkirine û hîskirine, ji ber wê dike gazî û hewar, hûn çi bikin hûn nikarin wê bê deng bikin û ew jî ji wê û virdetir nayê, ger hûn îcazê bidin min, ezê xwe nîşanî wê bidim û ezê gazî bikimê, da ku were vêderê, anceq az bikaribim wê bînim vir. Dema ku deyîka Fatê ev tişt anî ser ziman, li me pir sosret hat, li gorî dispilîna meya leşkerî gelek em destûrê nedin vî tiştî û gelek em nehêlin pêşmerge bi me bihisin, lê dayîka li wêderê sekinî her dikie qîr û hewar, di van çend demjimêrê ku dayîka Fatê li cem me bi rastî baweriyekî mezin dabû me, lewma me di navbera bawerî û pîvanê xwe yê leşkerîde dudilî jiyan dikir. Lê di herî dawiyê de, hevalan destûra çûnê danê û gotin: Tiştek nabe, lê ji dayîka Fatêre jî gotin gelek tu gelek dûrnekev e. Lê bersiva ku dayîkê dayî gelek balkêş bû, ji ber ku her axivtinekî wê ji bo me dersek bû û di eynî demê de jî rexneyekî giran bû. Dema hevalan destûr danê û jêre gotin, lê zêde dûr nekeve, dîse dikeniya û li me meyzedikir û ji mere digot: Kurê min dibe ku baweriya we bi min newe, lê





şaşîtiya meya derketî, ew bû ku me nizanî bû ku herdû sengerê li milê din valen e. Dema ku hevalan ji mere gotin sengerê heyî valene me rabû ji wan re got hûn jî werin cem me û em bi hevre tevbigerin, ew jî gihiştin me û me herçaran milê xwe dane hev û me senger girt. Em di cihê xwe de sekinîn û em hêdî bi pêşve neçûn, me dît ji nişkî ve dengê fermandarê leşkeran tê, wê dibêjê agir best. Wê demê me ji xwere got ji xwe tu niyeta me ya agir bestê nîne emê şerbikin, me wê demê ji xwere got ev dîn bûye yan jê mejiyê xwe xwariy e. Di wê nvberê de têgihiştin ku êrîşek li ser wam heye û ew dinava çemberê dene û wê tenê çadir ji wanre mane. Ji ber wê yekê xwestin êrîşê ser me bikin, wê demê çalakî zivirî pevçûnê û me cihê xwe saxlem kir, dinya jî tave heîv bû, ji ber wê ji mere pir xweş bû heryekê ji nava çadiran berû me dihat me lê dida, bi rastî me hêdî ne dixwest ku em bizivirin, me ji xwere digot meyê girtî û wê her tişt di destê me deye, ji ber wê emê lêbidin ka wê bi kû ve derkev e. Ji ber ku em zêde germ bûbûn, ji xwe heger ku ferman ji qordînê nehatibe dibe ku em bi şûn ve nevekişiyaban. Ji ber me ji xwere digot emê lêbidin heyanî seharê, ji xwe cihê me jî xweş bû. Me dît ku qolê me yê jorê jî lûtkeyê xwe sitandin e, lê heyanî ku em li hev kom nebin em rewşa hev û helê hev nizanin, dema ku qolê dî sengerê xwe digrin, bi Bêsvingan danîne çadiran, ji bo wê çadirek agir pêket, ji her milî ve hevalan li çadiran dixistin. Em di herdû cihan de bi serketin û me gelek çek jî ji ser dijmin rakirin, lê jê wêdetir em biçin dibe ku em windayiyan bidin, ji ber wê em xwe naxin wê rîskê. Ji ber ku me heyecana tola hevalan rakirin û heyecana pîrozbayiya 15 dehê Tebaxê bi hevre jiyan dikir, ji ber vê yekê me dixwest ku em çalakiya xwe bi serkeftî bê ku teliyê hevalekî xwîn jê were bidawî bikin. Gotina veşartî ya paşve vekişan dinê hate dayîn, ji xwe tiştek ji me kêm nebû me têra xwe dida ber qîran û tilêliyan, dema ku navê hevalê Reşo hate gotin, ew jî gotina meya veşartî ya ji bo vekişandinê bû,

çirkên pê ket yê sobayî dizanî bû ku ev dengê nericiye, ji ber wê heme xwe avête erdê, êdî çalekiyê destpê dikir û dengê narinca, guleyê Qilêşan û rokêtê Bêsvingan di nav hev de dihat. Nericok di sengerê de teqiyan, lê dema yê sobayî karkir bireve bi Qilêşê hate kuştin, hevalê Rênas sê gule lêdan û ew bi erdêre kire yek, ji xwe yê di hindirê sengerê de narinceyan ew bê halkiribûn, em ketin hindirê sengerê de me dît yek jê hîn saxbû, me dixwest em wî bi xwere bînin lê me nikarî bû em wî bi xwere rakin, ji ber ku herdû lingê wî çûbûn, me rabû hemû anîne cem hev, hevalê li kêleka me jî, wan jî destpêkiri bûn ji ber ku dengê gurmêna narinceyan xweş dihate guhê me, hemû tişt di destê me dey e, ji ber ku me hemûyan di eynî demê de dest pêkir, di wê navberê de me rabû Megewîca xwe rakir û di hindir de Gewîcek jî hebû me rakir, em ji hebûna du çekan fêrbûn ku dido ji wan leşkeran hişedar bûn û yê din çawîş bû, me rabû radyoya wan jî anî û çeydana wan jî ya ku ji parçeyê nariceyan kun kunî bû bû jî anî, me dêrbûna wan ya şev jî anî, cidayî wê pênc zincîrê Megewîcê. Me niyeta şûnde kişandinê nebû, ji ber me dixwest em dewam bikin, sengerek dî di kêleka me hebû, ne ji milê hevalan ve û tê de henek hebûn, ewan texmîn dikir ku qezakî di hindirê sengerê de rûday e. Ji ber ku zêde gule nehatin avêtin, tevahî guleyê me avêtîn bi qasî deh guleyan bû. Em di hindirê sengerê dene me dihna xwe dayê vaye leşkerek bi milê meve tê, ewan texmîn dikir ku weke her car leşkeran li derdorê xwe gule reşandine, ji ber wê leşker bi serbestî dihat û bê çek bû. Me ji xwere got em dengê xwe nakin heyanî bighêje cem me wê demê emê wî bi dest bigrin, ji berî ku bigihêje cem me hevalê Rênas gazî kir : Hemşerim nêreye gidiyorsin, wê demê di gotinê de têgihişt ku emin, dema zanî ku emin heme bi şûn ve reviya, dema ew reviya me jî da dûv wî û me got emê wî bigrin, em qederekî ketin pey wî me dît ku ev îş bi rîske, wê demê me guleyek lêda û me ew jî kuşt, me rabû cenazê wî jî anî cem yê din,





baweriya min bi we tê. Nêzîkî deh gavan ji me dûrket, lê ji berî ku biçe jî, ji mere digot: Hûn dizanin ku ez jinekî ixtiyarim û gelek deng ji min dernakeve, lewma geleke ez henekî dûrbikevim. Ji ber ku tu çareyekî cuda di destê me de nebû, ji ber wê em mecbûrbûn ku em bi dayîka Fatê bawerbin. Dayîka Fatê bi qasî çend gavan ji me dûr ket û gazî dayîkê kir, di wê navberê de dema ku dayîka ciwanê li cem me dengê dayîka Fatê dikir, me dît ku henekî sekinî, ji ber ku bi rastî dayîka ciwanê li cem me pir dikir qîre qîr. Dema ku deyîka Fatê gazî wê dayîka din kir heme me dît ku wê bi milê meve tê, lê dema ku dayîka ciwan gihişte cem me û em dîtin û cavê wê bi kurê wê ketin û têgihişt ku rewş hîn cudaye, cardin da ber qîr û hewaran, em dîse wê gavê mane heyîrî emê wê jinê çawe bidin sekinandin, û bitaybet dema kete nava pirs û axaftinan de û ji mere digot: we çime kurê min girtiye û hûn çime bernadin û herwha….

Me çiqas kir û nekir me nikarî em wê dayîkê bê deng bikin û rasiya rewşa heyî pê bidin fihêmkirin. Wê gavê dîse dayîka Fatê ew teselî kir û rehetkir û her pêre diaxivî û jêre digot: Ev jî mirovin û însanin û bele sebeb wê çime kurê te bigrin, mane vaye ez jî li vêderê li cem wanim, eybe şerme pêwîst nîne ku tu bitirsî, bi vî awayî ew dayîk jî teselî kir. Êdî me li wêderê di hindirê ewlehî û sitarê de heyanî demekî û bi rêya dayîka Fatê xwe girt, heyanî ku dema çalakiyê hat. Dema ku em û dayîka Fatê ji hevdû qutbûn, dayîka Fatê weke fermandarê wê giropê tevdigeriya û ji wan re rêzanî dikir û ji mere digot rêya min di milê ku hûnê têre biçin çalakiyê bû; lê ji ber we ezê bi milê dinve biçim û xwe berdim ser rêkê û van kesê li vir jî bi xwere bibim, ji ber ku ew mil ewleye û dema ku tiştek biqewime ne bandora xwe li me dike û ne jî li we dike. Dayîka Fatê xatir ji me xwest û ji mere vegot: Ezê biçim û mala min li Bamernê ye li filan cihî ye, ji ber wê dinyaye eger hûn hatin û rêya we bi van deran ket, ango dema ku hûn di çalakiya xwe de bi serketin, ez wê gavê

dixwazim hûn werin mala min û çayekî yan jê parîk nan bixwin, bi vî awayî me dayîka Fatê birêkir, dibe ku mirov nikaribe hemû hestên xwe bi gotin û nivîsandinê bîne ser ziman, lê ez dixwazim bibêjim ku em bi qasî bîst hevalan bûn, û ez bawerim ku bandora ku dayîka Fatê li ser me tevan kirî, ne mumkinê em jibîr bikin. Ji ber ku bandorekî wê yê mezin li ser me hebû, hem ji milê hestan de û hem jî; ji milê zanebûnê de û li cem min jî weke kesayetekî, dayîka Fatê cihekî xwe yê weke feylesûfekî hey e û tim weke dayîkekî ku jiyan bi hemû milê xwe ve û dagirtî jiyan kiriy e.Em vegerin ser çalakiya xwe, di wê navberê de dema ku dyîka Fatê ew girop girt û çû, hevalê meyê din jî cihê xwe girtibûn û êdî wextê çalakiyê dihat. Ji ber wê piştî fermana qordîna çalakiyê hate dayîn, ji wê û bi şûn ve ketina me ya tevgerê çêbû. Ez dikarim bibêjim ku hemû tiştê dayîka Fatê ji mere gotî heme heme bêje me ew pêkanîn. Em berû lûtkeyê ku pêşmergeyan xwe tê de bi cî kiribûn bûn. Di wê navberê de me riya xwe ya çiwîna kopik bi şîşê çeka xwe ji mayînan paqijkir û piştî me riya heyî kire di bin ewlehiyê de, di wê demê de her yekîneyê hevalê me yê paristinê li kopik didan bê rawestandin û ne dihiştin ku pêşmergê heyî serê xwe rakin. Piştî ku me rêka xwe ya çiwînê vekir, me dest bi êrîşê kir. Ji xwe pêşmergeyê di nava kopik de zêde li per xwe nedan û tepe di demekî pir kin de newekî me texmîn dikir kete destê me; lê dîse jî ji ber meseleya paqijkirina mayînan hevalekî me yê ku demekî dirêj jî bû ku di hinirê sengerê de şerdikir, ji ber xemsariyekî pêl mayînê dike û şehîd dike ve, ew jî navê wî Azad bû, hevalekî ji Serhedê bû. Çiqas hevalê me yên qordînê û li pey hev hişyariya mayînan ji hemû hevalan re jî kiribûn, lê ji ber xemsariyekî rûdanekî wise çêbû, hayanî di esnayê çalakiyê de jî dîse hişyariyê fermandarê ku çalakî bi rê ve dibir ji hemû hevalan re hate kirin û li pey hev dihate gotin. Çiqas em ji ber van hişyariyê hevaln, ji gelek mayînan xilas bûn jî, lê dîse me hevalekî





çawîşe hatiye cem hişedaran û herduyê din ji xwe hişedarê sengerêbûn, çaydanekî çayê çêkiribûn û ji xwere ça vedixwarin û Radyoyekî wan jî hebû ji xwere li stiranan guhdarî dikirin, ji ber wê me jî bi wanre ew awaz guhdarî dikirin, me rabû dest avête Megewîcê, lê lingê wê di nava keviran de bû, ji ber vê yekê eger me bihejandibe wê leşker bi me bihesiyane, me dikarîbû bihejan de lê ji ber ku me tiştek ji hevalê xwe yê din nizanî bû, lewma me rabû devjê berda û carekî din me li kêleka sengerê xwe bêdeng dirêjkir, sûbayek navê wî ez neşaşbim Osman bû, ji ber ku dema hete kuştin navê wî hate gotin, ew dem hîn di bîra min deye, ew weke dewriyekî li sr hişedaran tevan digeriya, dema me dît berû sengerê ve tê me xwe bi dîwarê sengerê ve kire yek ji bo ku me nebîne, dema ku gihişte ber sengerê leşkerê di sengerê de rabûne ser xwe, sobayî ji wan rewşa heyî pirsî, bersiva wan jî dayî gotin çi nîne, lê wan nizanî bû ku wê henek li ber dîwarê sengerê sekinîne û wê nariceyên wan di destê wandene û destê wan wê li swe tetîkê ye û kîjan xolekî wê destpêbikin ne diya re. Osmanê sobayî weke gotinin pêşiyan ecelê wî hatibû, ew jî li wê derê rûnişt ji bo ku çayekî vexwe, wê demê me ji xwere got eve bûne çar ji mere henekî din baştir bû. Demê ku ji çalakiyê re hatî belî kirin hêdî berû saniyê xwe yê dawiyê diçû, ji ber vê yekê me herdû hevalan narincê xwe kirin nava destê xwe de û em mane li benda teqandina guleya yekemîn, em hemû heval weke hev dihizirîn û bi yek hal û hereketê tevdigeriyan. Me li seheta xwe temaşedikir, demê me berû saniya dawiyê diçû, me her tiştê xwe yê ku ji dûr û nêzîk ve werin xwiyakirin veşartibûn heyanî me sehetê xwe paç kiribûn û çekên xwe me li gorî tava heyvê diguhert, an ku her tiştê ku were xwiyakirin me tedbîrê wê girtibû, me pîmê narinceyên xwe kişandin û em bi wê jî difikirin biyî ku derzî li fînyayê bikeve em narinceyê xwe navêjin, ji bo ku em mecalê revê ji tu leşkerekî re nehêlin, dema me pîmê bumbê kişand û

hêdî dinya tarî dibû û her yekîne digihişte cihê xwe, tektîkê me yê bingehîn ji bo vê çalakiyê ewbû ku emê bi dizîkan bikevin nav dijmin de û emê lêbidin biyê ku bi me bihsin, ango pêwîstbû ku em sengera yekemîn bi dest bêxin, em çidikin bikin gelek em xwe bighînin sengeran û bistînin bê ku dijmin bi me bihis e. Eger wê demê bi me hisiya serkeftina çalakiya me dikeve rîskê de, ji ber vê yekê pêwîst bû di eynî xolekê de lêdaa hemû hevalan bi hevre çêbibe û di eynî demê de çiwîna ser dijmin û vekişandin bi hevre were çêkirin, ji xwe heger weke em dixwazin ji mere biserife emê di tepe de meydanê ji dijmin re bixwînin. Em her du heval bi hevre ketin hereketê, hereket bi şêweyekî pir hesas hate çêkirin û me her tişt dîqet dikir ji dengê lingan bigre heyanî şikestina zilikekî di bin piyê mede dema em berû sengerê dijmin bi rê ve diçûn, bi qasî me di keşfa çalakiyê de tiştê heyî li ber çavan girtin me di dema çiwînê de jî du qatê wê dikşande dîqetê, her ku em nêzîkî mewziyê dibûn dem teng dibû û heyecana me zêde dibû, tiştekî sosret bû heyecandkî mezin bû bi mere rihekî tolhildanê yê pir mezin di da avakirin, em gihiştin binya sengerê dijmin û hînjî sê xolek ji mere mabûn, bi rastî tucaran gotin nikarin wê heyecana ku me jiyan dikir bîne ziman, ji ber ku me heyecana serkeftinê ji milekî ve jiyan dikir û ji milê din ve jî pêwîst bû ku dijmin bi me nehise heyanî ku hevalê din jî cihê xwe bigrin ji bo ku em bi hevre dest çalakiyê bikin, em di binê sengeran de rûniştin û dijmin jî di sengeran de sekinî bû. Hevalê li kêleka min ji minre got, were em ji berî ku çalakî destpêbikê em henek tiştan bikin, ji xwe demê me pir hebû. Di wê navberê de me got emê Megewîca li ser sengerê danî bidest bêxin ji berî ku çalakî dest pêbikê. Min jî got cewelahî ejî tevlî te dibim, were em tiştekî wise bikin. Ji ber ku senger henekî ji me ve bilimd bû em rabûn bi dîwarê sengerê ve hilkişiyan jorê. Di hindirê sengerê de me fekiriyê vaye sê leşker di hindirê sengerê de rûniştîn ne, yek ji wan li gorî texmînê me





xwe ji ber mayînan şehîd da, lê belê tepe kete destê me de. Hemû yekîneyan bi lez û bi rihekî êrîşê yê weke birûskan erkê xwe bi cih anîn û pîlanê me dayî pêşiya xw ku heyanî heftyekî jî pêwîst be emê bajêr bikin nava çemberê de, lê tişta me texmîn nedikir ji mere pêkhat û tepe di çil û pênc xolekan de kete destê me. Bajar bêje heme heme hemû ketibû destê me û hevalan hemû çekên cuda yên ku li malan dişuxilîn bê bandor kiribûn û pêşmergê mayî di hindirê kelhê de mabûne asê, ji ber hevalan heyanî devê kelhê jî girti bûn; êdî tenê têde li berxwe didan, armenca hevalan ji kuştina wan zêdetir dîlgirtina wan bû, lê ji ber ku baweriya wan nebû, lewma li berxwe didan. Bi vî awayî çalakî pêşket piştî ketina her sê cihê bingehîn yê paristina, hijmarekî zêde ji hevalan xwe berdane nava bajêr,

Di nava bajêr de em rastî gelek tiştê balkêş hatin, ji ber ku mirov weke Gerîlayekî dema ji gel qutdibe, wê demê dinavbera hestê wê û tişta ku civak jiyan dike heyanî astekî dûrketin çêdibe. Ji ber wê ji xwe havalê ku bi kelhê ve mijûl dibûn ji xwe pê ve mijûl dibûn û hevalê din bi serbestî di nava bajêr de digeriyan. Di wê demê de em rastî tiştên balkêş dihatin. Ji ber ku gelê bajarê Bamernê meyzandina wan li me û hestê wan beramberî me pir cudabû, di rûyê wan de, di danûstandinê wan de sankî hîç tiştek li vî bajarî ne qewimiy e, ne şer, ne pevçûn û ne dengê çekan. Ji ber em dema rastî kî dihatin bi silavekî gerim û bi kêfxweşî pêşwaziya me dikirin, ev jî li cem me hestekî wise dida çêkirin ku em ne hêzekî biyanîne û em xwediyê vî bajarîne û xwediyê vê xakên e. cidayî wê yê ku ji mere av tanî û yê ku xwarin ji mere tanîn, welhasil ez dikarim bi bêjim ku her yekî tiştekî ji mere tanî û dema em di ber mala kîre derbas dibûn hemûyan jî em dawetê mala xwe dikirin, ji ber wê ev nêzîkatiya ku gelê bajarê Bamerê ji mere nîşan dida, bandorekî pir mezin li ser me di da çêkirin, lê tiştê herî balkêş û di be ku tesadif be jî, ew bû ku em dîse li dayîka

Fatê rast hatin. Wê gava ku dayîka Fatê di xwest derkeve ber derî, cavê wê ji nişkî ve bi me ket û axiftinê xwe yek bi yekî anî bîra me tevan û ji mere digot: Hûn nizanin xwedî li derewê xwe jî derkevin, ji xwe min ji were gotibû werin mala min, deka derbasî hindir bibin, çayakî xwarinekî bixwin û henekî bêna xwe vedin. Lê ji ber ku em di nava çalakiyê de bûn û demê me destûr ne dida ku em xwe gîro bikin, ji ber wê çiqas dayîka Fatê xwest ku em rûnin lê em derbasî hundir nebûn, ji ber wê dayîka Fatê rabû ji mere zebeşek anî û li ser destan kire dîlim dîlim û her hevalekî ji me dîlimek da wî. Ji ber van nêzîkbûnê dayîka Fatê heme bêje ew jî bi mere bû ji destpêka çalakiyê heyaî dawiya wê û ji me qutnebû bû. Bi vî awayî çalakiya me bi serket. Dihate belakirin ku nêzî sêsed pêşmergeyî di Bamernê de ye. Gelek pêşmerge hatin kuştin û gelek ji wan birîndar bûn û yê din hemû reviyan û di vê çalakiyê de hêzên hevkarê dijmin derbeyekî pir giran xwarin. Çalakiya me bi ser ket û bajar bi tavayî kete destê me, lê êşên ku me di hindirê çalakiyê de jî kişandî jî hebûn. Ji ber ku di dema çalakiyê de ji serî heyanî dawiyê me nêzîkî heft hevalan şehîd dan, mixabin hevalê Eyhan di cihekî ku me texmîn nedikir de şehîd dikeve, ev jî bûne bedelê vê çalakiyê û êşê vê çalakiyê. Cidayî wê şehadeta hevalê Hesen hate jiyan kirin, Qivirciq Hesen, ew heval jî bi rastî, ji bo me bedelekî giran bû, ji ber ku hevalê Hesen fermandarekî ku erk û karê xwe di astekî herî bilinde di da meşandin, cidayî vî hevalî jî gelek hevalê din jî di vê çalakiyê de şehîd ketin ji wan hevalan, hevalê Azad û hevalê Gerdûn, bi rastî şehadeta van hevalan ji bo me bedelên pir giran bûn. Encamê çalakiyê 33ê çekê sivik yê takekesî hatin rakirin û gelek çekên giran, Hewan, Doşka jî hatin bi dest xistin, lê ji ber ku derfetê rakirina wan nebû, hevalan ew hemû telef kirin û bi vî awayî çalakiya me bi serkeftî dawî bû

Vegotin Baran Cizîrî





xwe bigrin, hevalekî me yê ku ji berî niha şehîd ketibû navê wî Reşo bû ji ber vê yekê gotina meya veşartî ji bo vekişandinê Reşo bû. Li gorî vê dema ku me gotina veşartî bi navê ş- Reşo da, tê wê wateyê ku herdû yekîneyên me yê êrîşê karê xwe bi ser xistin e, wê demê ew yekî ne wê bişûn ve vekişin û yekîneyên din yê paristin û teqwiyê wê lê bidin heyanî hevalê êrîşê xwe gihadî saxlemiyê û dema ku birîndar çêbûn gotina veşartî ya birîndariyê Cesûr hate dayîn, ji ber vê jî heger ku alîkarî hate xwestin pêwîste hevalê paristinê biçin alîkariya wan hevalan, ji xwe teqwiya yekîneya êrîşê ewê bi xwe bikevin dewrê, ji her du qolan re û ji hevalê cihê xwe di teqwiyê de jî digrin hate gotin ji ber ku gelek tiştê ku ne dihisabê de gelek caran derdikevin pêşberî mirov û pêwîsta mirov tedbîrê wan jî bigr e. Her yekîneyekî paristinê Bêkêsiyek û Bêsvingek bi xwere birin û di nava giropa teqwiyê de çekekî Bêsvingê hate bi cihkirin bi hevt guleyan re. Em bi rêketin û me xwe gihan de sirtê ku dikeve beramberî cihê çalakiyê û me hemû hevaln bi hev re li cihê çalakiyê temaşekir, bi rastî xweşiya çalakiyê di wê derê de bû, dema ku hemû hevalan bi hevre temaşeyî cihê çalakiyê dikirn û bi hevre, kêm û kurtiyên mayî temam dikirin. Ez dixwazin vê jî bêjim ji berî ku em biçine wê derê û ji bo ku em wê çalakiyê bi ser bêxin bi rastî me dîlanekî pir xweş girt û hemû heval dinava coş û heyecanekî pir mezin de bûn. Me di demekî wise de çalakî pêk anî, tava heyvê çarde şevî bû. Bi rastî dijmin hêvî nedikir ku emê di rojekî wise de êrîşî ser bikin, ji ber vê yekê me jî rojekî wise ji xwere neqand ji bo ku em wî di xefletê de bigrin. Em gihiştin cihê dawiyê yê ku em hemû hevalê çalakiyê li wê derê ji hev qutbibin, me hemû hevalan xatir ji hev xwest û em çûne riwê hev û em hemû jî xwediyê biryara serkeftinên e û em xwedî wê yeqînê bûn ku em hemû çawe ji hevdû qutbûne emê wise jî ji çalakiyê bi serkeftî dîse vegerin cem hev, lê li hemberî hemû tiştî me xatirê xwe ji hevdû xwest û em birêketin, hêdî

hevalan haziriya xwendina navê hevalan dikir, me tevan hewaya çalakiyê jiyan dikir û me çalakî ji berî ku em bikevinê biserxistibû û me dinava wê de jiyan dikir. Piştî xwendina navê hevalan, bişiklê du qolê êrîşê heval hatin belav kirin û ji bo qolekî teqwiya wê hate belîkirin û qolê dî bê teqwiye bû û li du cihan paristin hate danîn. Ji xwe hêzê me yê heyî ancex têra vê yekê dikir. Di encamê de du qolên êrîşê û qolekî teqwiyê û du qolên parastinê û qurdîneyekî. Li ser vê belakirinê nêrînin hevpar derketin holê. Hevlê ku cihê xwe di yekîneya êrîşê de digirtin ji xwe cihê ku wan jî dixwest ew bû, ji ber vê yekê wan qet dengê xwe dernedixist, lê hevalê ku cihê xwe di yekîneyên parastin û teqwiyê de digirtin henekî moralê wan ne li cih bû. Ji ber ku her hevalekî dixwest cihê xwe di yekîneya êrîşê de bigre, di vê derê de mirov rihê êrîsê û rihê serkeftinê baş didît, ev rihê heyî rihê berxwdana Tendûrekê bû rehê tolhildana hevalan bû, ji ber wê yekê gelek hevalê ku tevlî yekîneya êrîşê nebûyî digriyan û gelek heval ji wan acizbûna xwe tanîne ser ziman, ji ber vê yekê ji milê hevalê sebrî ve her tişt hate nîşandan û li ser her tiştî hate rawestandin. Tevahiya hevalê ku cihê xwe di nava yekîneya êrîşê de digrin neh heval bûn. Li ser vî bingehî her yekîneyekî erk û gurevin ku dikevin ser mêlê wan ji hemû milî ve xwedî wê hişyarbûnê bûn û her yekî ji van yekîneyan dema ku yekîneya din bikeve nava tengasiyê de pêwîste yekîneya din alîkariya wê bike û pêwîst bû ku hemû heval hevdû temam bikin weke xelekan bê ku qutbûn bikeve navbera wan de. Li ser vî bingehî û bi vî rehî em bi rêketin û ji ber ku weke neha îmkanê me yê ku em bi Bêtêlê xwe bighînin hev nebû, lewma me gotina veşartî ji bo çalakiyê da xwiyakirin.

Hemû ziraviyên çalakiyê li ber çavan hatin girtin, li gorî wê me biryar girt ku di demjimêr neh û nîvan de emê çalakiya xwe destpêbikin û gelek hemû yekîne heyanî wê demê cihê





## DILÊN BI HEVRE LÊDIDIN

Xweza çiyan ji hmû milê xwe ve tijî bîr, hest û asolên bê sînor e. Ji ber vê jiyana gerîlan jî weke xwezaya xwe bi vîn, evîn û hebûneke aza de û ji bo gihiştina vê jiyana azad xwe

ji her milî ve tevlî vê jiyanê dike, ji bona afrandina jiyanekî bê qeyd û bend pêşengiya gelê xwe û mirovatiyê her tim dike.

Lewra Gerîlatî bi jiyna xwe û hevaltiya xwe ya bê sînor tê nasîn, ji vê hevaltiya heyî mirov coş û heycana serkeftinê digre û ji bo vî rihê hevaltiya heyî jiyana xwe feda dike bê ku dudilî jiyan bike. Ango hemû hevalên Gerîla weke giyanekî tevdigerin û dilê wan ji bo gihiştina azadiyê bi hevre lêdid e.

Sal 1994'rê bû li Çiyareşkê pevçûnekî pir giran rûda, rojekî pêşiya pevçûnê heval li Qernêsê bûn, li Qernêse berbiseharê ve, ji mêlê Colemergê ve, hem ji milê Kutranisê ve, bisêçarqolanve leşker hatin ser hevalan, seharê hayanî êvarî pevçûn dewamkir. Di vê pevçûnê de gelek leşker hatin kuştin û dijmin derbeyên pir giran xwar, ji ber vê yekê dijmin hayanî astekî gavên xwe bişûnde avêtin. Berbiêvarîve hevalan xwestin ji Qernêse xwe bighînin Çiyareşkê, dinya şev bû û hêzê hevalan pir giran bû, jı ber kû hijmarê hevalan du bîrlikbûn ango tabûrekbû. Heval di wê navberê de dema ji Qernêse diçine Nebirnavê û piştre dema ku dixwazin berbi Tûzekê ve biçin ji bo xwe bighînin Çiyareşkê. Seharê dema ku dinya ronî dibe û rojê tavêje, hîn heval negihiştibûn Çiyareşkê.

Dijmin jî di wê navberê de ferq dike, ji ber wê yekê hem Çiyayê Leyzokê û hem Çiyareşkê milekî wê, dijmin bi şev xwe lê bi cih kiribû û li benda hatina hevalan bû. Heval dema dighêjin binya Çiyareşkê dinya dibe roj, cihê ku heval gihiştinê zozanbû lê dijmin dinava kurs û tehtên asê û veşartî de bû, seharê dema heval gihiştin binya Çiyareşkê, pevçûnê destpêkir, di wê navberê de henek hevalan xwestin milekî Çiyareşkê bigrin, lê dijmin bihêza xwe navbera tabûrê û yekîneya kû lûtke girtî de qutkiribû,

Erdîngariya hakimî ser qadê hemû dijmin girtibû û peyre derdorê hevalan kirin çemberê.





serkeftî dihesiband ji ber wê dev ji xwe berdabûn, me ev tişt di dema hereket û pergala çiwîn û hatina leşkeran di dema seharan û ber bi êvaran ve dît di dema keşva çalakiyê de. Ji ber wê em gihiştin wê baweriyê ku emê vê çalakiyê bi serkeftî pêkbînin bê ku teliya hevalekî xwîn jê we re. Cidayê wê me dît ku fermandarê qereqola leşkeran bê ku hisabê tu tiştî bigre werzîşa xwe ya seharê dike bi cilê razanê. Wê demê me ferqkir ku em dikarin bi ser bikevin. Civîn hate çêkirin û encamê keşfa 3 rojan ji hemû hevalan re hate ragihandin ji hemû hêlên xwe ve. Nêrînê hemû hevalê ku çiwîn keşfa çalakiyê bêje heme heme hemû yekbûn, ji ber ku hemû nêrîn, hemû biryar û îsrara hevalan yek bû. Bi rastî jî dema ku te li rewşa wê demê ya ku li qada Tendûrekê temaşe dike, rih û biryarekî wise pêwîst bû ji bo ku tu bikaribe dijmin di wê derê de bişkîne û tola hevalan hilîne û ji milekî din ve ev çalakiya me rastî pîrozbayiya 15 dehê Tebaxê dihat, ji ber wê yekê cihekî xwe yê cuda hebû. Ankû em di vê çalakiyê de ji milekî ve ew birînên ku Tendûrekê di dilê me de vekirine bikewînin û ji milekî din ve jî emê birastî pêngava 15 dehê Tebaxê pîroz bikin. Ez neşaş bim yan di nabvera 13 – 14 deyê Tebaxê de bû, rojek heyanî durojan ji berî 15 deyê Tebaxêbû. Em dinava biryarekî wisa de bûn, hîn ew dîmenên berî çiwîna çalekiyê li ber çavê minin, ji xwe hijmarê me 25 hevalbûn, henek hevalên din jî hatin cem me lê me ew hevalê mêvan tevlî çalakiyê nekirin, çiqas ku îsrarê wan hevalan çêbû ku ew jî tevlî çalakiyê bibin lê me ji wan re got:Hûn mêvanin û hûn ji dûr ve hatine û westiyane, ji ber wê pêwîste hûn bêna xwe vedin. Hemû hevalê li wê de rê heyî ji hevalê Sebrî bigre heyanî hvalê din, hemû dinava biryara serkeftinê de bûn, ji milekî ve me hewaya serkeftinê jiyan dikir û me ji milekî din ve jî digot dema ku em vê çalakiyê bi ser nexin emê nikaribin cihê xwe di Tendûrekê de bigrin, lewma ji bo ku ev rihê serkeftinê newê şikandin pêwîste hemû hevalê heyî xwedî vê biryarê bin. Dema ku

girtibûn me pir zorahî kişand heyanî ku me xwe bi cih kir, cihê ku dijmin girtîn ev bûn: Girê nêriyan, Ş- Azad, Ş- Doxan, û xwe di gelek cihê din de jî bi cî kiribû, ji ber vê yekê li gorî berê me nikarîbû em tevbigerin. Di destpêkê de me heyanî demekî haziriyên xwe yê bingehîn pêkanî, ji bo ku em bikaribin şerekî li wê derê bimeşînin. Dihate xwestin ku bersivekî were dayîn ji ber vê yekê em tev di nava guftuguhan de bûn ka emê bersivekî çawe bidin dijmin. Lê pêwîst bû ku em bersivekî wisa bidin dijmin û em beramberî wê tu wendahiyan nedin, em xwedî biryarekî wisa bûn, ji ber vê yekê em xwedî hewildan û îsrarekî bi vî rengî bûn. Li ser vî bingehî civîn hate çêkirin, fermandarê me yê wê demê hevalê Sebrî Tendûrek bû, civîn hate çêkirin û weke armenc tepê Ş- Azad hate hilbijartin ji bo ku em çalakiyê li ser bikin, tişta ku di civînê de hate guftuguhkirin ew bû ku me gelek êş û zehmetî kişandin e, lewma pêwîste ku em di vê çalakiyê de bi pîlan û tektîkin wise bi ser dijmin de herin ku teliya hevalekî xwîn jê newê. Wek çawe rêber APO gelek caran daye xwiya kirin: Şer ji berî şer tê qezenckirin. Ji ber vê yekê me ji xwe re ji berî ku em biçin ser dijim got pêwîste em di vê çalakiyê de xwînê nerjînin. Ji ber ku em xwedî biryarekî wise bûn pêwîst bû ku em hemû ziraviyê vê çalakiyê li ber çavan bigrin, ji ber vê yekê bi şiklê kom kom û li ser hev keşfa cihê çalakiyê hate kirin, hemû hevalan cihê çalekiyê dîtin ji xwe hêzê me ji ber ku kêmbû, hemû hevalan cihê xwe di çalakiyê de girtin. Dema ku me keşfa çalakiyê kir di dema keşfê de ev derkete pêşiya çavê me hemûyan, ji ber ku hêzê ku tepe digirtin bîrlikekî hereketlî bû û erdîngariya cihê çalakiyê henekî çal bû û derdorê wê çend kopik hebûn. Li ser kopikan hişedarê wan hebûn û di nîva kobikan de biryargeha wan bi cih dibû, hemû leşker di hindirê çadiran de disekinîn, dema me keşfa çalakiyê dikir me dijmin di nava xefletekî pir mezin de ditî, biştî wan oparisyonên xwe yê dijwar û mezin yê dijmin xwe têde





Bi şefeqêre pevçûnê destpêkir û heyanî êvarî dewamkir.
Di vê pevçûnê de gelek leşkerên dijmin hatin kuştin, lê gelek heval jî di vê pevçûnê de şehîd ketin. Ji wan hevalê şehîd ketî hevalê Serdar jî hebû, hevalê Serdar fermandarê bîrlikê bû. cardîn hevalê Cîhadê Nîtê hebû ew jî, berpirsyarê taximêbû û hevalê Ismayîl Dêrik hebû ew jî berpiesyarê taximêbû û weke din hevalê Çekdarê Garisî hebû ew jî li ser taximê bû, cidayê wê gelek hevalê fermandar û şervanê din jî hebûn, weke Hevalê Sefqan, hevalê Mezlûm, hevalê Akif û hevalê Ferzende hebûn. Di nava hevalên şehîd ketî de gelek hevalê ciwan jî hebûn. Hevalê Sebrî, hevalê Kemal û hevalê Egîd. Bîrlika hevalan bîrlikekî tim dinava hereketêdebû û demekî dirêj li qadên Botanê gelek çalakî kiribûn û çalakiyê ku pêkanîn çalakiyên gelek serkeftîbûn, lewma dijmin jî ev yek ferqkiribû û ji bo ku vê bîrlikê ji holê rake gelek çaba hewildan dane meşandin û gelek rîsk dane berçavan, ji bo hihiştina vî ermencê xwe, gelek leşker anîbûn cihê pevçûnê û cidayî wê gelek teknîk jî bikaranî. Pevçûnê di navbera heval û leşkeran de, ji seharî heyanî êvarî ajot, gelek heval şehîdketin, lê sedemê şehadetê van hevalan ew bû, ku hevalan nexwestin ku hevalê şehîdketîn û hevalê birîndarbûyî bimînin nava destê dijmin de. Dişûna ku henek heval ji nava pevçûnê derkevin û xwe xilasbikin û yê din jî dinava pevçûnê de bihêlin; hevalan bigiştî pevçûn dane berçavê xwe, heyanî êvarî pevçûn sing bi sing dewamkir, di dûrbûna narincokan de pevçûnekî pir giran destpêkir. Ber bi êvarî ve, hevalê Serdar û neh heval tenê dimînin.
Hevalê Serdar û hevalê din dikarîbûn xwe xilasbikin, lê ji ber ku henek hevalên birîndar hebûn û ji bo tola wan hevalên şehîdketî rakin, berbiêvarî ve hevalê Serdar û hevalê din carekî din dikevin êrîşê û divê êrîşê de hevalê Serdar û neh hevalên pêre şehîdikevin. Bigiştî 49'heval di vê pevçûnê de şehîdikevin. Di serî de hevalê Serdar û hevalên din ji şervan û fermandaran.

Lê dema ku mirov behsa hevalê Serdar dike. Yan mirov wî bibîrtîne. Hevalê Serdar, hevalekî dinava şerde pijiyayî bû û xwedî tecrûbeyên şer û êrîşê bû, di her çalakiyê de herî cihê zehmet û cihê ku qederê çalakiyê belîdikir hevalê Serdar cihê xwe li wê derê digirt û diher çalakiyê de tim serkeftin bi dest dixist, ji ber vê yekê baweriya hevalan gelek bi hevalê Serdar dihat û her hevalekî dixwest tim bi hevalê Serdar re bikeve yekîneya êrîşê. Hevalê Serdar hevalekî bi cesaret bû û xwedî tecrubeyên êrîşê bû, hostabû dizanîbû bi çi awayî biçe ser dijminê xwe û wî têxe xefkê û derbê lêbid e, dizanîbû çawe biçê ser çeperê dijmin; ji ber vê yekê hemû hevalan tim dixwestin bi hevalê Serdar re biçin êrîşê. Cidayî wê hevalê Serdar tucaran hevalê xwe yê şehîd û birîndar nedihiştin nava destê dijmin de, ci biqewimiya tucaran dev ji hevalê xwe bernedida. Cardin hevalê Serdar li ser çeka xwe pir hakim bû, ji ber ku gelek perwerda leşkerî dîtibû û hakimiyeta wî li ser teknîkê hebû. Ango hevalê Serdar fermandarekî ji gelek milê xwe temambû û di jiyanê de jî hevalekî pir dilnizimbû û hevalê ku hevalê Serdar nasnedikir dema ku dihate bîrlika wî nedizanî ku hevalê Serdar fermandarê bîrlikêye. Hevalê Serdar hevalekî di jiyana xwe de dilnizim bû dikarîbû têkeve dilê her hevalekî û di şerê xwe de jî pir keskîn û li ser dijminê xwede weke şûr diçû, lêdixist û radikir. Ji ber vê yekê dema ku hevalan pevçûna çiyareşkê bihîstin kîn û nifreta wan sêqet li hemberî dijmin zêdetir bû. Çiqa ku pevçûna çiyareşkê şerekî giranbû û dijmin bi hêza û teknîka xwe hate ser hevalan, ji ber wê windahiyên hevalan zêdebû, lê ji milekîdin ve kêmasiyên hevalan jî têde hebû. Kêmasî neya wê bîrlikêkbû, xeteyên henek bîrlikên dinbû, ji ber ku xeberdabûn hevalan ku Çiyareşkê didestê medeye û saxleme, lê peyre ji ber xemsariya hevalan û negirtina wan ji cihê xwe re, dijmin dişûna wande cihê xwe digre û hevalê ku ber bi Çiyareşkê ve diçin baweriya xwe bi hevalan anîbûn û birehetî bê ku





Şehîd dengê jiyanê ye, lewma bê naskirina rastiya şeyîdan mirov nikare rastiya jiyanê jî nasbik e. Ji ber vê yekê rêber APO dibêje: “Partiya me partiya şehîda ne.”

Lê belê, jiyan tenê dikare bi rastiyê xwe re were jiyan kirin, lê ger mrov dixwaze bi azad bijî û bide jîn, pêwîste bedelên giran buha bide ji bo avakirina vê jianê. Di be ku temenê mirov têrê neke ku fêkiyê dara ku çandî bibîne, lê xweşik bûna vê darê û şînahiya wê mirinê bê wate dike, jiyanê dike serdestê jiyanê û şûna ku mirov dihêle li vê jiyanê hebûna wî tîne ser ziman. Di serî de ez dixwazin behsa gelek tiştên ku li qada Tendûrekê de hatine jiyan kirin û bi serpêhatiyekî ji we re bînim ser ziman. Ji ber ku Tendûrek demekî pir dijwar jiyan dikir. Sal 1994’ran bû û li her derî Buhar di meha Adarê de dihat, lê Tendûrek Buhara xwe di meha Gulanê de pîroz dikir. Ji ber ku warê Serhedê bi giştî jî û bi taybet zozanê xwe. Ango Kurdistan Buhara xwe di Adarê de pêşwazî dike, lê li warê Serhedan Buhar di meha Gulanê de tê. Di navbera meha Adar û Gulanê de û di destbêka Adarê de, oparisyonên ku li herêma Serhedê destpêkirin û heyanî dawiya Gulanê ajotin, tê de pevçûn û şerên pir giran rûdan, di van şer û pevçûnan de gelek rêhevalên meyê hêja û biromet şehîd ketin. Dibe ku bi sedan leşker hatin kuştin, lê şehadetê hevalan tim û tim birînekî di dilê hemû hevalan de vedikir. Ji ber vê yekê pêwîst bû ku tola wan hevalan were hilandin. Ji ber vê yekê piştî van oparisyonên dijwar yê ku dijmin bi rengekî hovane bi ser hevalan de dihat. Ji ber vê yekê hêzên me ji mecbûrî ji herema Serhedê vekişiya. Lê piştî wê bi demekî me bi girobekî biçûk berê xwe da Serhedê, wê demê hijmarê hevalan 25 hevalbûn, ji ber ku dijmin gelek qadên wê

bû dixwaze çekê eskerê kuştî ji ser wan rake, lê dema ku diçe ser cenazeyê wan leşkerên kuştî, ji dûrve leşker mermiyan tavêjine wî û wî şehîd têxin, wê dema ku hevalê Îhsan şehîd dikeve hêdî me nikarîbû em biçin ser cenazê leşkeran, tenê me dikarî em cenazê hevalê xwe henekî ji wir dûr bêxin. Dema ku cenazeyê leşkeran di nava lepê mede man leşkeran biçavkorî êrîşdikirin, me heneke dî xwe bi şûn de vekişand. Çalakî li gorî hatî pîlankirin birêve diçû, lê tenê şehadeta hevalê Îhsan li ser hevalan pir giranbû, leşkerê ku hevalê îhsan şehîd xistî jî kesekî ew nedidît ji ber ku 10 cenazeyê leşkerên kuştî hevalan bi çavê xwe dîtibûn û ji ber vê yekê hevalê Îhsan bi hesanî dixwest ku çekê leşkeran ji ser wan hilîne, wê gavê şehîd dikeve. Dema ku hevalê Îhsan şehîd dikeve hevalan digot: Pêwîste em tola wî hilînin, ji ber wê yekê dema ku leşkeran xwestin ku cenazê xwe bibin û weke pîlanekî dinava pîlanlemeyê de hate çêkirin, birengekî lez û bez hevalan cihê xwe girtin, dema ku leşker hatin hevalan bihevre û ji her milîve li wan dan. Hevalan encamekî pir baş bidestxistin. Çalakî ji her milîve weke hatî pîlan kirîin birêve çû, lê çalakiya herî serkeftî ewe ku tu hîç wendahiyan di şer de nede. Çalakiyê bandora xwe pir li ser derdoran çêkir û me dema ji nûçeyan bihîst ku 15 leşker hatine kuştin, wê çaxê hîn coş û heyecana hevalan mezintirdibû, soz û biryara wan ya tolhildanê xurtirdibû.

Vegotin Cimşîd Gever

## GOVENDA SERKEFTINÊ





hesabê dijmin bikin berbû çiyareşkê ve ketibûn rê û bê ku ewlekariya xwe bigrin ketin çiyareşkê, dijmin jî ji vê yekê sûd wergir.

Lê birastî berxwedana Çiyareşkê pir cihekî xwe yê taybet heye û dengekî pir xurt veda. Windabûnê meyê Çiyareşkê pir giranbûn. Di hemû êrîşên ku 1994'ê de çêbûyî pir biserkeftîbûn.

Hevalê Cîhad jî wisa bû, hevalan ew bi fermana leşkerî tevlî nava bizavê kiribûn, lê piştî ku rastiya rêxistinê fêrdibe biryara xwe ji nûve di de û tevlî nava refê bizavê di be, hevalê Cîhad hertim xwedî biryarekî xurt bû di jiyanê de, di sala 1989'an de tevlî PKKê bû bû, demekî dirêj li qadên Çirav û Gabarê ma bû. Cardin hevalê Mezlûm Batuwî hebû. Hevalekî ew jî bi fermana leşkerî tevlî bizavê bûbû sala 1989'an fermandarê yekîneyê bû, ew jî demekî dirêj li qadên Gabar û Çiravê mabû, lê piştî naskirina wî ji PKK'ê re, ew jî biryara xwe nûdike û tevlî nava bizavê dibe û tevlîbûna xwe ji dil û can çêdike. Cardin hevalê Çekdar hebû, Çekdarê Kevzinî, buhara 1994'ran ji qada rêberiyê hatibû, hevalekî fermandarê taximê bû, hem erkê xwe yê fermandariyê pêktanî û hem tişta ku ji rêberiyê girtî dixwest bide hemû hevalan û bi wanre alîkarbe, bitaybet di milê rêxistinî û bîrdozî de û ji bo pêşxistina tektîkên şer desteka wî ji bo hevalan gelek çêdibû. Cardin hevalê İsmayîl Dêrik hebû, hevalekî kevinbû, ji Dêrika Hemko bû. Hevalê İsmayîl jî demekî dirêj li Gabar, Besta û Garisa mabû, hevalê İsmayîl di wê îşerî de gelek erkê xwe bicihanî, heyanî guleyên wî diqedin şerdikê û ji bo ku nekevê destê dijmin de nariceya xwe bi xwe ve diteqên e.

Weke din hevalê Sefqan hebû, hevalekî ji Efrînêbû, di salên 1990'de tevlî nava refê hereketê bûbû, wî jî perwerda rêberiyê dîtibû, ji wê yekê hem hêza ji rêberiyê girtî û hem tecrubeyên xwe yê leşkerî dida hevalan û di jiyanê de bi hevalan re parve dikir û birastî jî bûbû hevalekî serokatiyê, ji

wê yekê hevalekî hem dilnizim û hem ji bo ku bi hevalanre alîkarbe pir çaba nîşandi da; ji ber ku gelek hevalên me ciwanbûn û hîn rastiya hereketê û şer nasnedikirin. Cardin gelek hevalên ciwan hebûn, hevalê Egîd hebû, hevalekî ji Qurtelanêbû, di sala1993'de tevlî hereketê bûbû, temenê xwe 17'de salîbû, ji ber temenê wî yê ciwan me nedixwest ku em diçalakiyan de wî pêxin pêş de, lê hevalê Egîd di şerê çarçêlan de berxwedanekî bêhampa da nîşandan. Cardin hevalê Sabir hebû hevalekî ji Erohê bû, ji gundê Êrsêbû, hevalekî temenê xwe 16'de salîbû, di sala 1993'de hevalan bi fermana leşkerî ew tevlîkiribûn, ew heval jî demekî şûnde biryara xwe di de û tavlî refê hereketê di be, hem di şer de û hem di jiyanê de herdem ji hevalan re mînakbû. Herweha hevalê Kemal jî hebû, hevalekî temenê xwe 15'deh salîbû ji gundê Şikeftiyê girêdayî Sêrtêbû, çiqas ku hevalekî temenê xwe biçûkbû jî; lê herdem cihê xwe di nava çalakiyan de digirt û hevalekî pir fidekarbû, di en qişûlê zor û zehmet de hevalê Kemal cihê mural, coş û hêviyê ji bo hevalan bû, ango cihê ku hevalê kemal lê ba ew der tim cihê şahî û kêfê bû. Weke hevalê kemal gelek hevalê din jî hebûn hevalê Avareş hebû, hevalekî ji Başurê Rojavabû dinava xebatê gel de cihê xwe digirt, bandorekî pir mezin li ser gel çêkiribû. Bê goman van hemû hevalan di hindirê şerê Çiyareşkê de xwestin bibin bersiv, ji ber vê yekê hemû heval yek bi yek şehîd ketin û çiqasî ku dijmin bi hemû hêza xwe ya leşkerî û bi teknîka xwe bi ser hevalan de diço, lê yek tenê jî ji hevalan, ne xwe radestî dijmin kirin û ne bisaxî ketin destê dijmin de; heyanî guleya xwe ya dawiyê şerdikin û narinceyên xwe bi xwe ve diteqînin û xwe radestî dijmin nakin. Ji ber ku hemû hevalê çiyareşkê girêdanekî wan yê pir xurt bihevre hebû û tucaran serî li beramberî dijmin neditewandin û heyanî dawiyê girêdayî giyan, rih û felsefeya PKK'ê bûn. Ji ber vê yekê mirov dikare bibêje şerê Çiyareşkê ji bo me wendahiyekî pir giran bû, şehadetên pir





rêbû, me heneke din xwe nêzîkî rêkir ji ber ku heger dijmin birêde were em bikaribin lêbixin. Ji ber wê demê me zanîbû sehatê derketina dijmin ya oparasyonane, ji ber ku timî di navbera demjimêr sisê heyanê çaran de derdiketin oparisyonan. Wê çaxê hemû yekîneyan heneke din xwe nêzîkî cihê çalakiyê kirin, derdorê sehat pence seharê de, dema ku dunya henekî ronî dibû leşker ketin hereketê, lê ne ji bona oparasyonêbû. Ji ber ku hejmarê wan hindikbûn, leşkerê ku ji çeperên xwe derdiketin henekî bi rêve meşiyan û di cihê xwe de rûniştin. Wê demê fermandarê me got: Heger ku wan em dîtibim pêwîste em lêbixin, nêzîkî 20 xolekan leşkerê hatî di cihê xwe de rûniştî man, li gorî ku hevalê nêzîkî leşkeran dengê wan dibihîst dema ku leşkeran ji hevre digotin ma dibe ku Apûçî hatibin van derdoran. Ji ber wê yekê tevgera leşkeran neweke wan rojên din bi serbestbû, lewma leşker didu didu û çeprast pêşde dihatin.

Me jî ji xwere digot: Bimeşe bimeşe mehmeçîk were her tuyê bixwî. Ji rewşa leşkeran hemû heval dikeniyan hevalê di çeperande bicihbûbûn pir bi xwînsarî tevdigeriyan û heyanî ku dijmin gihişte cem çeperê me biqasî 5 gavan, wê demê hevalan ji her milîve li wan da, wê demê leşker şaşomaşo dibûn û tiştek ji rewşêa heyî fêmnedikirin, ji ber ku cih zozanbû leşkeran nizanîbûn xwe bi kûve bidin. Wê demê dinavbera leşkerên ku dipêşdehatîn û yê di pey wande dihatin qutbûn çêbû. Leşkeran nizanîbûn ne bi şûn ve vegerin yan jê bi pêş de biçin. Çiqas ku alîkarî jî xwestin Qobrayê jî nikarîbû were cihê çalakiyê. Me ji Fûzyayêre digor hirç, lewma dema ku hevalan digot wê hirçê bînin wê gavê Qobrayê jî nidiwêrî were cihê çalakiyê. Ji ber ku qobrayê jî nikarîbû were cihê çalakiyê. Pevçûnê di navbera me de bi qasî 45 xolekan berdewamkir û me hîç cihê xwe berneda, piştî ku fermandarê me biryar da ku heval gavekî xwe bişûn ve bikşînin, wê demê me gavekî xwe bişûnde da. Di wê navberê de, hevalê Îhsan yê ku bi eslê xwe ji Geverê

hevalên ku cihê xwe di parastinêde digrin hate belîkirin, heyecana çalakiyê di rûyê hemû hevalan de xwe bi rengekî eşkere dida diyarkirin û hemû hevalan xwe dinava çalakiyê de didîtin. Hewildana hemû hevalan hebû ku her yekî ji wan cihê xwe di nava koma êrîşê de bigre û herkesî di dilê xwe de digot ma gelo navê min jî dinava giropa êrîşê de heye an no. Dema ku fermandarê qadê hate pêşiya hevalan ji bo xwendina navê hevalê ku tevlî çalakiyê bibin, her hevalekî li benda xwendina navê xwe bû û hemû hevalan bi heyecaneke mezin li nava çavê hev dimeyzandin. Di dawiyê de nav hevalan hate xwendin û her hevalekî cihê xwe dinava yekîneya xwe de gir û hemû xalên ku werên dîqet kirin ji hemû hevalanre hatin diyarkirin, rê û rêbazê tevgera çalakiyê hatin diyarkirin. Ji ber ku wê hemû heval cihê xwe bi şev bigrin ji ber vê yekê agir an tiştên ku dibiriqin pêwîste werin dîqetkirin û pêwîste di dema meşê de ber ji ber lingê hevalan nexindirin û hemû xalên girêdayî dispilîna hereketê werên dîqetkirin. Ji ber ku nêzîkî cihê çalakiyê gund hene û seyên wan zû bi mirovan dihsin, lewma pêwîste di dema meşê de her tiş were dîqetkirin û hemû pîvanên girêdayî tevger û hereketa gerîla pêdivî pêheye ku li berçavan were girtin û bi hestiyariyeke mezin bir biçav were girtin. Berbitariyê ve hemû heval ketin hereketê û her yekî cihê xwe girtin, ji ber ku di qadên Çarçêlan de ev cara yekem bû ku çalakiyeke bi roj wê were kirin, ji ber vê yekê herkesî heyecana wê jiyan dikir û bitaybet diqada Çarçêlan de û li wan zozanan cihekî xwe yê cida li cem hemû hevalan dida çêkirin. Dinavbera demjimêr dozed û yekan de, hevalan xeber da ku tevgerek dinava leşkeran de heye lê em nizanin ji bo çiye, wê demê hevala texmîn kir ku dibe ku dijmin xwe ji bo oparisyonê amededikin. Dema ku hevalan wise xeber şand hevalan ji hevre digotin ku oparasyonbe wê pir başbe, emê derbekî pir baş li dijminbixi. Di wê nevberê de ji hemû hevalan re hate gotin ku pir şiyarbin û ji ber ku yekîneya me ya herî nêzîkî





giran çêbûn, lê şehadeta van hevalan di hindirê mede hîn rihê tolhildanê û intîqamê bilintirkir û xurtirkir. Ji xwe piştî şerê Çiyareşkê hevalê tabûra hevalê Adil yê ku navê xwe kirin tabûra tolhildanê û ji bo bîranîna hemû şehîdên Çiyareşkê, ji nûve hemleya 1994'ran ya peyîzê destpê kirin yek ji wan jî çalakiya Serxetê bû û hemû çalakiyên hatîn kirın ji bo bîranîna şehîdên Çiyareşkê bû.

Vegotin Reşîd Dosto

## LI BIN RONAHIYA HEYVÊ

Mardîn careke din cavê xwe ji xewa şêrîn vedike, ji bona afrandina jiyaneke aza û biromet û careke din zarokê xwe bi hêviya rojên xweş û şad ji bona nûrojeke serfiraz hembêzdike.

Sal 1997'tan bû em li qada Mardînê bûn, hijmarê me bi qasî sê heyanî çar hevalan bû, me weke yekîneyekî xwe bi rêxistin kiribûn ji bo haziriyên erzaqan têra demekî dirêj. Ji bona vê yekê me erzaqên xwe ji gundan derdixist, bi taybet wê demê û di wan şert û mercan de peydakirina pêdiviyên xwe yê xwarinê pir zorbû, ji ber ku ji milekî ve oparisyon her tim hebûn û ji milê din ve li ser gel zilm û zordariyeke mezin hebû û li her deverî şer û pevçûn bûn, ji ber wê henek zehmetî û zorahî hebûn.

Hem ji bona Bagokê û hem ji bona deverê din jî ev her wise bû, tenê li devera Omeriyan henekî îmkanê xwe hebûn. Ji ber vê yekê me xwest ku em henek haziriyê erzaq ji wan deran derxin. Ji ber wê çiwîna me ya gund çêbû û du yekîneyên hevalê xebatê gel dikin jî bi mere bihatibana gund. Ji ber wê me ji derveyî gund hevdû dît û di wê navberê de me karê xwe bi hevre iyarkir û me cihek belîkir ji bo ku dema em ji gund derkevin emê li wê derê hevdû bibînin.

Me wise ji hevre got: Kî ji me ji berê yê din gihişte cihê ku me belî kirî pêwîste li benda hevalê dî bimîne û bi vî awayî emê bi hevre herin cihê xwe.

Hevalê din, bi şiklê du yekîneyan di nava gunde belavbûn, lê em sê hevalê mayî bi hevre di nava gunde digeriyan. Bi vî rengî û ji ber ku gund mezin bû, em dinava gund de





dernekeve pêdivî heye ku hemû yekîne cihê xwe baş nasbikin. Ketina meşê çêbû berû girê ku neha jêre dibêjin şehîd Ezîz, di binya wî çiyayî de kaniyeke avê hebû û cihê çalakiyê jî başdihate dîtin, sekna me li ser wê kaniyê çêbû û her hevalê ku dibû hişedar cihê çalakiyê baş didît û tevgera dijmin jî baş ferqdikir. Dema em ketin hereketê çeteyê li beramberî me derdorê me dane ber hewanan, wê demê me dizanî ku ew car caran ji xwe de derdorê xwe didine ber topan, ji ber wê me meşa xwe domand. Diher çalakiyên leşkerî de rîsk hene lê pêwîste ku em van rîskên heyî di asta herî jêr de bigrin dest. Ji ber vê yekê car caran dema ku tû dikve çalakiyekî tu ji xwe re dibêje, di vê çalakiyê de dibe ku du heval şehîd bikevin, lê vê rîska heyî tu datixîne yek hevalî; ji ber wê yekê dema ku tu diçî çalakiyê di encamde yek heval jî şehîd nakevê, ji ber ku tu tedbîrê wê ji her milîve digrî. Li ser vî bingehî bi hemû hevalanre li ser çalakiyê hate axafti û pêwîstiyên ku werin dîqetkirin di dema çalakiyêde. Nexşeya çalakiyê ew bû ku yekîneyekî wê girê ku dijmin têde bicih bûye bigre û dema ku dijmin hat ewê wê demê li dijmin bixin û leşkerên ku dipêşiyê de tên wê li wan bixin û çekên wan ji ser wan rakin û hevalê din yê parastinê ewê jî wê demê li leşkerên dipeywanretên bixin. Hevalê diçeperan de ewê xwe şûndebidin. Ji bo saxlamiya çalakiyê çar cihê ji bo parastinê hatin belîkirin, yek ji wan yekîneyan ewê li ser rê bisekne û rêya heyî dibin quntirolêde bigirin û nehêlin çeteyên wan deveran derbasî cihê çalakiyêbibin û komekî din jî ewê di cihekî dinde hakimiyeta xwe li ser gir û sirtikên derdorê ewê çêbikin, da ku hatina dijmin asteng bikin, yekîneya mayî yek ji wan di cihê qordîna çalakiyê de dimîne û ya din li cihekî din hakimiyeta xwe li ser cihê çalakiê çêdike û rênade ku dijmin derdora hevalan têxe çemberê. Her yekîneyekî cihê xwe girt û xwe ji her milîve ji bo ketina çalakiyê hazirkirin. Civîn hate çêkirin û navê hevalên ku biçin ser çeperê dijmin hatin kifiş kirin û

keşifkirin û saxlemkirina, cihên wan berbiçav dihate girtin û ji çiwîna van yekîneyan heyanî zvirandina wan ji çalekiyê, ji hemû milîve di ber çavanre dihate derbaskirin. Ev hemû tiştê medayî xwiyakirin pêwîste di berçavanre werin derbaskirin heyanî çalakî li gorî ku tê xwestin were kirin. Piştî ku hertişt hate temamkirin, li ser vî bingehî çar girop derketin ji nava hemû hevalan, her tiştê çalakiyê li gorî ku hevalan dixwest bi wîrengî bû û bi hemû kûrbûn û hûrbûna xwe çalakî hatibû hazirkirin. Çalakî bi hemû milê xwe ve dinava hevalan de dihate gotobêjkirin û piraniya hevalê hazir nêrînin xwe li ser çalakiyê didane diyarkirin. Di dawiyê de nêrîna hevbeş ya ku derketî holê ew bû ku çalakî ji milê hemû hevalan ve hate pejirandin. Di wê demê de û ji ber şerê taybet yê ku dijmin li beramberî gerîla pêşdixist dinava gel de, rêber apo jî pêwîstiya çalakiyeke bi vî rengî di cih de didît. Ji ber ku hemû dehayetin dijmin vale derkevin û dinava gelde hêz û rastiya pkk'ê were xwiyakirin. Ji ber van sedeman pêwîstbû ku çalakî werên kirin.

Ji ber ku sala 1997'tan weke sala fînalê dihate naskirin, lewma haziriyê vê yekê ji her milî ve dihatin kirin û ji ber van nedenan hemû heval bi xwestekekî mezin dixwestin tevlî çalakiyê bibin. Êdî hertiştê çalakiyê hazir û amedebûn, ango ji milê keşif, nexşe û ji milê binesaziya wê ve, êdî li ser vê binesaziya ku hatî kirin tevger dihate meşandin. Bi vî awayî em ketin meşê, her çiqasî ku keşif û pîlanlemeya çalakiyê hatiye kirin jî, lê ji berî çiwîna cihê çalakiyê pîwîstbû ku hemû yekîneyên ku tevlî çalakiyê dibin ji nîzîkve cihê çalakiyê bibînin û nêrînin xwe yê dawiyê jî li ser çalakiyê bidin. Raste hevalê ku çiwîne keşfa çalakiyê ji hemû milîve çalakî girtina dest, lê pêwîste ku hemû hevalên ku diçine çalakiyê jî cihê çalakiyê bibînin û nêrînin xwe li ser bidin û riya çiwîna çalakiyê û riya zivirandinê baş nasbikin. Ev hemû amedekariyên ku hatine kirin pêdivî pê heye; ji ber ku komên ku diçine çalakiyê pirin û da ku şaşîtî





belavbûn, wê demê qereqol jî ji gund ve nêzbû û Navê gund jî Cinate bû. Heyanî derengê şevê em di nava gunde digeriyan. Me karê xwe heyanî astekî tememkiri bû, ji ber ku derngê şevê bû hêdî hêdî gundiyan jî haziriyê xwe yê xewê dikir.

Ji ber wê me jî hêdî hêdî haziriyê xwe yê derketinê dikir, me tevan karê xwe qedandi bû û êdî me karê xwe dikir ku em ji gund derkevin. Li herema Mardînê ji ber ku car caran li derdorê gundan kemîn dihatin avêtin, lewma heyanî astekî tehlukeyê xwe hebû û dihate xwestin ku em gelek şiyarbin. Lê vê carê me hesabê vê yekê nekiribû, wê demê tava heyvê hebû û ronî bû, demjimêr dinavbera yazde û dozdehan de bû. Ji ber wê yekê min digot em zû ji gund derkevin û biçin, ji ber ku neha heval li benda mene û dem dereng e. Wê demê ez bi bayê bezê li pêşiya hevalan bi rêketim, hijmarê me jî wê demê bi qasî sê hevalan bû, lê hevalên din hijmarê wan şeş heval bûn. Dema em ji gund derketin bi qasî bîst gavan ez li pêşiya hevalan bûm û dema em nêzî cihê rendewiyê bûn, wê gavê min dît wê sê kes li cihê rendewiyê hereket dikin, wê demê min ji xwere got: Helbet hebe nebe, ew neha hevalin û li benda me li ser rê sekinîne da ku em bigihêjin hev û em bihevre biçin cihê xwe. Wê gavê hîç ne dijimin û ne hizrandina kemînê di bala min de hebû, ji ber wê yekê heyanî çeka xwe jî min ji milê xwe ne anî bû xwarê. Gava ku em nêzîkî cihê rendewiyê bûn, ewê li wê derê sekinîbûn dijmn bû û di kemînê de li benda hatina me bûn. Ji ber ku ew cihê ku me lê rendewî dayî hev uşken bû û cihê gihandina riyan bû, cihekî kavil bû, dîwar û kevir li wê derê hebûn û ji bo vedana kemînê cihekî hrî baş bû. Dema ku bi qasî pazdeh heyanî deh gavan em nêzî cihê rendewiyê bûm, min bihîst dengek tê û bi tirkî gazî dike û dibêje, dûr sen kîmsin, ango bisekne tu kiyî û pêre pêre wan ez dame ber gulayan, wê demê min xwe avête erdê, lê hevalê li pişt min hêstir di destê wande bû ji ber wê dema gule teqiyan wan hevalan serê

hêstiran berdan û hêstir di nava gun de belvbûn, lê ez mame di nava wan de hew min dît û nedît ku ez dinava toz û dûmana guleyan de mam û gule weke baranê bi ser min de dibariyan. Bi rastî wê demê ez pir şaşo maşo dimam, ji ber ku gule weke baranê bi ser min de dibariyan, lê yek jî ji wan guleyan li min neketi bû. Heyanî dema ku leşkeran li min dayî jî min texmîn dikir ku hevalin, ji ber wê yekê min bi dengekî bilind gazî dikir hevalê Sadiq hevalê Sadiq we neke! we neke! çime tu yariyan bi min dikî? Ji ber ku heyanî wê gave jî min texmîn nedikir ku dijmine. Min ji xwere digot qey, hevalê Sadiq, Serdar û hevlê Dijwar û hevalê dî ne. Ji ber vê sedemê min wise gazî hevalê Sadiq dikir. Piştî wê leşkeran tekmîla xwe dane qereqolê û ji wan re gotin: Me Gerîla xistiye kemînê û me du heb ji wan kuştine, ji ber wê fermandarê wan jî sipasiya wan dikir û ji wanre digot: Destê we saxbe, destê xwe nedin cenazê wan emê seharê werin wan bibin. Lê piştî xolekî du xolekan dema ku leşkeran xwestin sacûrê xwe bighorin, wê gavê min firsend bi destê xwe xist û min Qilêşa xwe li wan rastkir, wê gevê sê leşker li pêşiya min li ber dîwar xwiya dikirin, dema min gule yek bi yek li wan didan min guleyê xwe didîtin çawe li wan dikevin, ji ber ku wê gave min didît wê leşkerê li ber dîwar sekinîn, yek bi yek dikevin erdê. Piştî wê hêdî deng ji wan derneket, lê di wê navberê de min hew dît ku Narinceyek li ber min ket û teqiya, ji ber ku ez pir nêzîkî wan bûm, gekek parçeyên narincokê li min ketin. Ji ber wê piştî ku bombe teqiya, min ji xwere digot: Xilasiya min nîne, ji ber ku parçe gelek li canê min ketibûn û xwîn ji cihê birînan dihat. Wê gavê min ji xwere digot: Çi bibe bile bibe pêwîste ez dinava lepê wan de nemînim û ez zû ji vê derê derkevim. Min xwe bi şûnve da û min xwe hilde saxlemiyê. Bi qasî sed gavan min xwe ji cihê kemînê dûrxist, min ferqkir ku xwîn gelek ji birînê min diherike, wê demê min şûtika xwe li cuhê birînê girêda da ku xwîn henekî bisekne da ku ez hêza xwe wenda





dijmin û nûkeran re, bûye dojeh û ferman. Ji ber wê Zagros wê her cihê mêr û mêrxasan be, cihê baz û şêranb e.

sal 1997'tan bû weke tê zanîn salên pir germbûn bi çalakî û tekoşîna xweya beramberî dijmin û neyaran û ji her qadan dihate xwestin ku çalakiya bikin, di qadên Çarçêlan de me piratîk dida meşandin. weke her qadên din, ji me jî çalakî dihatin xwestin û dem demê çalakiyan bû. Ji ber ku dihate xwestin ku bersiv ji dijmin re were dayîn, di qadên çarçêlan de girê Sînewa hebû û me gelek caran keşifa wan girop li pey giropê verêdikirin û ji bona keşfeke nû dihate xwestin ku em keşfekî li ser wî tepî bikin, ji ber ku ji berî çalekiyê pêwîste keşfa cihê çalakiyê were kirin û peyre çiwîna ser hedefê pêkwere. ji ber ku bê keşif çalakî nayên kirin, ji ber ku serkeftina çalakiyê girêdayî keşfa cihê ku çalakî li ser were pêkanîne. pêwîste di serî de cihê dijmin yê zeyîf û lawaz di keşfêde derkeve zanebûnê û li gorî wê bi derbeyên giran bi ser dijmin de çiwîn çêbe û ji çalakiyê encam were girtin, gelek girop derketin ji bo keşfa cihê çalakiyê û bi xeberên ji derdoran me girtî û bi encamên keşvê yê ku bi rojan dewamkirin, piraniya îstixbaratan me birêyên ku heval têre biçin ser girên dijmin têde bicihbûne û bi serkeftî zivrandina wan ji çalakiyê were çêkirin.

taybetmendiyê vê çalakiyê ew bû ku dijmin wê were van giran bigre berbiseharê ve û emê bihatina dijmin re lêbixin. Cihê ku çalakî lê were kirin zozanin û xwezayekî bê dar û daristan bû, ji ber vê yekê pêwîstbû ku ji her milî ve keşfa çalakiyê were kirin û birengekî saxlem û birêkûpêk were kirin. ji ber ku dema keşfa çalakiyê baş neyê kirin dibe ku windayî pir çêbibin û çalakî bisernekeve û encamê ku em dixwazin ji çalakiyê bigrin dibe ku em bidest neyîxin, di dema keşfêde xeber ji çeteyan dihate girtin, û li ser tevgera leşkeran ji hermilî ve me agahî girtin, hemû milên girêdayî leşkeran û liv û lebata wan bi kûrahî dihate hesabkirin. Diserî de cihê hemû yekîneyên ku tevlî çalakiyê bibin hate

## HESTÊN Jİ NÛVE XWE BİLÊV DİKİN

Çiyayê Zagrosan xwedî cihekî xwe yê bi nav û denge di dîroka mirovahiyê de, ji ber ku jiyan li wan waran dest bi vejîna xwe kiriye û weke ku jêre dibêjin Hîlala zêrîn, xwedî şewq û hebûnekî biberekete. Ji ber ku Zagros ji milekî ve bi xweşikbûna xwe tê naskirin û ji milekî din ve jî bi heybet û ceberûta xwe ya ku tukesî nikariya serê wan lûtkeyên wê bitewîne, heyaî Eskenderê mezin yê ku her der fetih kir û xiste destê xwe de; lê dema ku berî wî dikeve çiyayê Zagrosan leşkerî wî nikare Zagrosan derbasbike û hemû tar û mardibin û bişûnve vedigerin. Lewma çiyayên Zagros her weke navê xwe ye û tenê ew cihê zarokê agir û rojê ye. Herweha Zagros bi baskên xwe kurdistanê bi tevahî hembêz dike û di navsera xwe de hestên azadiyê dihewî ne û tim ji





nekim û ji hişê xwe neçim. Hevalên din hemû ji hev qut bûbûn, û dinava gund de belav bûbûn, ji ber ku yê ku henekî ew dever nasdikir ez tenê bûm. Dema ku heval pêdihisin ku kemîn heye xeberê didine hev bi riya Bêtêlê û piştî demekî dighêjin hev, heyanî wê demê min jî xwe gihande wan. Dema ku ez gihiştime wan alîkariya min kirin heyanî me xwe gihan de cihê xwe. Heyanî rojek du rojan ji ber ku derman nebû rewşa me nebaş bû lê piştî wê dema ku em gihiştin hevalan rewşa me baştir bû. Di wê navberê de dijmin kete nava tevgerê de, lê mixabin tu encamp bi dest nexistin. Dijimin digot me du Gerîka kuştine, lê dema ku seharê hatin cihê kemînê û dîtin ku du leşker hatine kuştin û yek jê jî birînda re. ji dine xwe derket û xwestin ku qehir û aciziya xwe bi serê gundian de derxîne, lê gundiyan dema ku pê hisiyan ku heval bi silametin û tişta ku bi serê leşkeran hatî bihîst, wê gavê ji kêfa difriyan.

Vegotin Diyar Afrîn

## EFRANDINA JIYANÊ

Botan bi hemû rojên xwe yê dagirtî berxwedan, tekoşîn û pevçûnên jiyan û mirinê, her tim pêşengiya tekuşîna rizgariya netewa Kurdistanê kirî ye û bê sînor berdewam dike, ji ber ku jiyana Gerîla li botanê hate dinê û li botanê

mezin bû û xwe bi rêk û pêk kir û gelek şervanên azadiyê û fermandarên hêja di vê qadê de bi xwîna xweya zelal û buha xaka van waran avdan û ji gemara neyar û xwîn mijan paqij kirin.

Ji ber wê mirov bi rastî dikare weke ku tê gotin bêje Botan dilê Kurdistanê ye û di her tekoşîna qehremanên xwe û şehîdin xwe de destanên pakrewaniyê di dîroka Pkk ê de bi xwîna xwe û bi tîpên zêrîn cihekî xwe yê cuda, di dil, giyan û hestên me de hiştiy e.

Ji br ku di xeyalê her hevalekî de ew bû ku, çavê wî bi xaka Botanê bikeve, li ser çiyayên wê weke Cûdî, Gabar, Herekol û Feraînê bigere û henaseyakî ji henaseyên azadiyê li wan waran bikşîne cerg û hinavê xwe û bi wan dîmenên wê yên zindî û bêhampare melevaniya jiyanê bike.

Bi hilatina her her rojekî nû re, Botan hîn bêtir çirûskên xwe tajone erşê ezman û cihê xwe ji nû ve weke av zêmê di dilê her Gerîlayekî de digr e. Wê gavê dema mirov diwaze botanê bîne ser ziman, ne kaxez û ne hibra pênûsê têrê dike. Ji ber ku li botanê her tim jiyan û mirin di nava pevçûnê dene û ji bo ku jiyan bi ser bikeve her roj bi canfida û pakrewanên xwe jiyanê ji nûve diefirînin û govenda dilan digerîne.

Sal 2007'tan bû roj 7 tê meha Cotmehê bû em li qada Gabarê bû û ji ber ku em tim di nava liv û lebatê de bûn her gav em weke nêçîrvanê ku li nêçîra xwe digere dinava hazirî û amedekariyan de bûn. Ji ber vê yekê ez dixwazim li ser çalakiya Gabarê henek nirxandinê xwe bikin, ji ber ku çalakiya Gabarê cihekî xwe yê taybet di nava hemû hevalan de hebû. Çalakî bi vî awayî hate kirin ji xwe ji berî vê çalakiyê hevalan dixwestin leşkerê ku lûtke bi roj digirtin û bi şev diberdan bêxin kemînê, lê ev çalakî li gorî ku dihate xwestin nemeşıya û çalakî bêknehat. Ji ber vê yekê dema ku heval ji çalakiyê bi şûn ve zivirîn moralê hemû hevalan xirab bûbû, roja din biştî çalakiyê hevalê ku lûtkeyê jor digirtin û





hemberî dijmin didî meşandin, lê ji milekî din ve jî tu dibînê ku henekî din weke te diaxivin û li beramberî te şerdikin, lê mesele ne axaftine, lê zihniyete û mejiyê ku hatiye firotin û êdî ji xwe dûrketi ye. Ji ber wê yekê kîn û nifretekî mezin li beramberî îxanetê pêşdiket û gur dibû, çiqas ku zehmetî û zordariyên mezin me di wê de mê de jiyan dikirin jî, lê ji milê dinv jî rihê hevaltiyê û girêdana hevaltiyê di astekî pir bilin de bû. Lê di vê derê de tişta ku ez dixwazim di encamê de bînim ser ziman ewe ku, zorî çibe bile hebe û zehmetî çibin bile bibin, lê di vê derê de tiştek heye û her tim jî tê gotin: Ewe ku bawerî di ser her tiştî de ye, meseleya wan hevalan jî ew bû ku şerê jiyanê dikirin û bersivekî wise dane îxanetê. Raste hûn dikarin bi îxanetê me birîndar bikin, lê hûn nikarin bi erzanî canê me bistînin, raste hûn bi tarîtî weke Çeqelan di riya me de biseknin û me têxin xefkê, lê hûn nikarin vîna me bi dest bigrin, raste hûn dikarin her tiştî bikin, lê hûn nikarin hêviyê meyê jiyanê qutbikin, hûn dikarin me di milê fîzîkî de biêşînin, lê hûn nikarin me ji ramanê rêber APO qot bikin. Dema mirov berxwedan û tekuşîn wan rojan tîne bîra xwe, wê demê wê rastiya wê jiyanê û tekoşîna ku hatî jiyan kirin baş bibîne. Hevalê ku bi neh guleyan birîndar bûyî û di herî qişûlê zehmet de û di bê îmkaniyê de hewqa rojan li ber xwe bide û jiyan bik e. Ev ya bi serê xwe destanekî bêhampa ye û dîrokekî ku mirov nikare wê bi gotin û nivîsandinê bîne ser ziman. Lê ji bo ku her kes qehremantî, fidekarî û giyanê PKKê nas bike û şerê wê yê jiyanê û hebûnê li beramberî îxanetê û nûkeriyê nesbike, wê demê di giyan û vîna van hevalan de mirov baş dibîne û nasdike. Raste ew heval bi canê xwe ne di nava me de ne, lê bi giyanê xwe yê bê mirin tucaran nayên ji bîr kirin û em soz didina wan kû emê hêvî û tekoşîna wan ji bona azadiyê bicihbînin.

Vegotin Cimşîd Gever

nebûn ku em sîroman peyda bikin.wê demê bijîşk ji mere got: Em dikarin rêbazekî bidin meşandin heyanî ku heval bighîjin me, mirov nizane çawe bîne ser ziman, ji milekî ve tu xwîna xwe didî hevalan ji bona ku şehîd nekevin, lê ji milekî din ve jî tu ji bê îmkaniyê li ber cavê xwe dibîne ku hevalê te li ber cavê te û ji bê îmkanî şehîd dikevin, ev yek tukesî nikarî bû rabike, bi rastî mirov nizane vê yekê bi çi awayî şîrove bike, lê çi biba bila biba pêwîst bû ku em van hevalan ji şehadetê rizgar bikin, hewildanê me çêbûn û me girêdan çêkir, lê wan jî ji mere gotin: Ku li cem wan jî peyda nabe, lê gelek tiştê me veşartîne, em li nav wan meyzebikin dibe ku di nava wan de hebin, wê demê emê ji were verêkin, lê piştî piştî demekî şûn ve, saloxek ji mere verêkirin ku li cem wan jî peyda nabe. Heyanî demjimêr pêncê êvarî me xwe li benda dermanan girt, lê derman ji mere nehatin, wê demê di eynî wê demjimêrê de me xwe berda dola Notê. Em gihiştin ser ava Şîn û me xwe li wê derê bi cih kir, di wê navberê de haziriyê xwarinê dihate kirin, lê ji nişkî ve me dengê hevalan kir, wê gazî dikin zû werin wê hval şehîd bikevin, ji ber ku tu zanebûnên me li ser tenduristiyê nebûn û derman jî nebûn lê dilê hevalê birîndar hêdî sekinî bû û hevalê pijîşk jî ne li wêdê bû; wê demê ger ku zanebûnê me hebûna meyê ew heval ji şehadetê xilaskiribane. Di serî de hevalê Egîd şehîd dikeve, dema ku hevalê Egîd şehîd ketî hingî demjimêr deh û nîv bû û demjimêr yazdeh kêmî çil û pênc xolekan hevalê Xemgîn jî şehîd dikeve. Weke neha demjimêr û xolekên şehadeta wan tê bîra min, ji ber min dîroka wan rojan li cem xwe nivîsandi bû û cihê ku min ew heval lê veşartî min li ser darekî nêzîkî wê derê ew roj nivîsandi bû, ji ber ku ew roj ji bona me wata xwe cuda ne. Ez dixwazim vê bêjim piştî şehadeta van hevaln kîn û nifreta me li hemberî dijmin û îxanetê her ku diçû zêdetir dibû, ji ber ku dema ku tu li bersiva her tiştê çêdibin digerî, wê demê tu bersiva wan hemûyan îxanetê dibîn e. Şerek heye tu li





weke çevdêran derdor dikirin bin hakimiyeta xwe, xeber dan ku dijmin di nava hereketêde ye. Wê çaxê me bi şiklê çar yekîneyan xwe parçe kir. Yekîneyek hevalê Adil li ser disekinî û yekîneyek havala Gulbehar li ser disekinî, yekîneyeke dinjî ez li ser disekinîm û yek jê jî hevalê Bedran li ser disekinî.

Her yekîneyekî bi qasî 5 hevalan bû, me dixwest em ji çar milan ve êrîşî ser dijmin bikin. Êdî em weke min li jor dayî xwiyakirin mîna nêçîrvanekî dema ku dikeve pey nêçîra xwe li dijmin digeriyan, li kûderê me dijmin dît wê demê emê lêbidin. Em ketin nava liv û lebatê, hevalê Bedran bi yekîneya xwe bi cihekî ve çûn û em hevalê din jî heyanî cihekî bihev re çûn, û jê şûn ve em ji hev qutbûn. Em gihiştin cihekî me kemîn avêt, dijmin berû me hat, nêzî me bû lê bişûn ve vekişiya, wê demê yekîneya me û ya hevalê Adil bihevre bû, em herdû yekîne ketin pey leşkeran. Leşker ji milê tereta Gabarê ve hatibû, me henek heval rêkirin ser lûtkeyekî jorî xwe, ji bo ku hakimiyetê li ser derdoran çêbikin û em hevalê mayî tev ketin pey dijmin de. Dijmin xwe berda pesarê milê Dêrşe. Dêrşejî gundekî mezinbû ji gundê Gabarê. Em ji demjimêra 8 tê seharê ketin pey dijmin heyanî demjimêr 3ê biştî nîvro, carcaran em nêzî dijmin dibûn bi qazî 100- 200 mitran lê ji ber me dixwest em encam bigrin me xwest ku em hîn bêtir nêzî dijmin bibin, ji bo ku em derbeyekî bi enczm li dijmin bidin. Ji ber ku gelek yekîneyê leşkeran li derdorê me hebûn, me dixwest em yekîneyekî leşkeran têxin nava xwe û em ji wê çalakiyê encam bigrin. Yekîneya ku me ji xwe re kirî hedef biqasî 20 leşkeran bû, çalakiya me bi îsrara hevalê Adil çêbû û biserket, ji ber ku îsrara wî tunebane dibe ku me nikarîba em encamekî jê bigrin. Ez dixwazim bi rastî bibêjim ez û hevalê Adil gelekî bi hevre mane û her tim min hevalê Adil weke mamûsteyekî şer û fermandarekî leşkerî yê pêşeng ji xwere didît û cihekî hevalê Adil yê cuda li cem her hevalekî hebû.

Çalakiya me pir bi awayekî lez û bi bayê bezê weke bablîsokekî pêkhat. Piştî me li dijmin xist, sê heval hebûn hersê heval piştî wê bi demekî şehîd ketin e. Ji wan hevalê Harûn Torî bû û hevalê deniz hebû, piştî çalakiyê firokê cengê li qadê da ew heval jî birîndarbûn û durojan piştî wê çalakiyê şehîd ket, cidayî wê hevalê Serdem hebû ew jî ji gundekî Harûnan bû, ji gundê Şerikî bû, cardin hevalê Şahîn hebû bavê wî jî dostekî meyê li pêşbû. Hersê heval jî neha şehîd ketine. Piştî ku me li leşkeran da hersê hevalê min behsa wan kirî çûne ser cenazeyê leşkeran, wê dema ku her sê heal keti êrîşê û çûne ser dijmin me paristina wan dikir. Di wê navberê de hevalê Adil ew jî ji milekî din ve ketibûn êrîşê, navbera me û hevalê adil de bi qasî 20 mitran hebû, me jî di wê demê de xwe gihande hevalê ku ketin êrîşê, ji ber ku gelek leşker hatibûn kuştin û gelekan jî xwe kiribûn nava qelş û tehtan de ji bo ku xwe ji guleyê hevalan biparêzin. Ji ber ku derûniya dijmin gelekî xirab bûbû nikarîbû barsiva guleyê hevalan jî bide, ji ber wê yekê leşkerê xwe kirîn nava lat û şikêran de di cihê xwe de tevizî mabû ji tirsa, ji ber ku em ji her milî ve di nava êrîşê de bûn. Çiqas ku hijmara hevlan li gorî ya leşkeran pir kêmbû lê rihê leşkeran yê ku pê şerbikin nemabû û şikestibû li beramberî êrîşê hevalan. Mirov di vê derê de dibîne rastiya xwirtbûna hêzên taybet yê dewleta tirk û rastiya şerê wan yê ku tu bingehê xwe nîne. Lê rastiya şer ev e, dema ku tu dinava êrîşê debê wê demê her tişt di destê tede ye û hêza ku qederê çalakiyê di destê wê de wê hêza tebê. Ji ber ku derûniya şer û rastiya şer henekî cudaye dema ku tu dikevê êrîşê û diçê ser cenazê leşkeran û encamê jê digre. Ji ber ku me bihevre dît dema ku hevalan çalakiya ewil bi sernexistin çiqas derûniya hevaln berû xirabûnê diçû, lê dema ku hevaln çalakiya xwe li Gabarê biser xistin û gelek leşker kuştin û çekê wan bi dest xistin, wê demê te nikarî bû hevaln ji keyf û şeydayan big re. Encamê çalakiyê li gorî ku dijmin xeberdayî 13 de leşker





ketibûn û giraniyekî ji her milî ve hebû, li cem vê giraniyê tiştekî din hebû, ew jî di nava PKK ê de heye, ew jî ew bû ku coşa hevalan her li cihê xwe bû, ew coş jî coşa serkeftinê bû, ji ber vê di meşê de tu zorahî û zehmetî ji bona xwe nedikirin pirsgirêk û ji bona gihandina armencê çi tê xwestin dide û dik e. Ber bi demjimêr carê seharê ve em gihiştin binya kaniya Ga, wê demê Qubra hatin, lê ne bi milê meve dihatin lê dema xwe li hewa badidan wê demê ji milê me ve xuiya dikirin, wê çaxê me ferqkir ku pêwîste em bi lez û bez xwe ji vê derê derxin û xilas bikin. Henek hevalan digot: Êdî hêza me nema em nikarin bimeşin û hevalê li ser bişta hêstiran jî nikarî bûn xwe bigrin, bi qasî çar pênc hevalan bûn, me ew heval yek bi yek li pişta xwe kirin heyanî ku me ji boxazê derbas kirin û hevalê darbestê jî me bi vî awayî derbas kirin. Welhasil bi vî awayî me ji berî ku bibe sehar kaniya Ga derbaskir û me xwe da saxlemiyê, ji milê Oremarê ve yekîneyek hevalê me li wê dê hebûn, me bi wê yekîneyê re têkilî danî û me ji wan hevalan alîkarî xwest, me rewşa heyî bi şêweyekî veşartî ji wanre ravekir. Hevalan bi qasî taximekî heval ji bona alîkariyê bi meve rêkirin, wê taximê hem ji bona rêzantiya rê û hem ji bona alîkariyê destek dane me. Dema ku em gihiştin kaniya Ga wê demê demjimêr neh û bîst xolek bû, bijîşk hat û ji minre got: Me şaşîtiyek kiriye? Pêwîste em vê kêmaniya xwe telafî bikin, wê demê me xwest ku em vê şaşîtiya xwe nasbikin, hevalê bijîşk ji mere got: Sîromê me xilasbûne û sîrom nebin jî wê demê em nikarin van hevaln bi vî şiklî bibin. Bi rastê pir rewşekî xirab bû, ji ber ku me nizanî bû emê ji ku derê sîroman peyda bikin, lê dema ku tu jiyana wan hevalna û hebûna wan digre ber çavan tu ji xwere dibêjî, ger dermanê wan li ezmanan be jî pêwîste mirov peydabike, birastî piştî hewqa ked û emeka hevaln ji milekî ve û berxwedana wan hevalê birîndar ji milê din ve şehadeta van hevalan kes qebûl nake, çiqa em dibêjin kêmasiya meye, lê wê demê derfet jî

ku dijmin bi me nehise me bi roj nikarî bû em hereket bikin, ji ber wê çiqa ku zor bû jî ji bona wan hevalê birîndar, lê em mecbûrbûn ku em bi şev hereket bikin ji ber ku em hêzekî Gerîlane û tê xwestin em li gorî rêzik û pîvanên Gerîla tevbigerin.
Di dema meşê de me pir zehmetî di rê de dikşandin, wê demê heyanî Meranoz ancax em meşiyan û em wê şevê li Meranosê man, pir rîska xwe hebû seknandina me li wan deran, lê hevalê me li wan deran hebûn û wan ewlekariya me digirtin heyanî li me bû sehar. Roja din seharê em ji wê derê ketin rê, wê demê hevalê Egîd hîn li ser xwe bû û diaxifî û carcaran bi mere yarî dikirin û dikeniya, çiqas ku birînê wî giran jî bûn lê coşa wî li cih bû û bi mere diaxivî û dem bi dem dibeşişî. Hevalê Egîd hevalekî henekî bejna xwe dirêj bû têra xwe he gir bû, lê hevalê Xemgîn ne dediaxifî, me dizanî ku ew şiyare lê ne diaxifî, ji ber ku dermanê hatîn şuxlandin li ser wî bandorekî giran kiribû û pêwîst bû demekî di sere derbas bi be heyanî bandora wan dermanan ji ser wî biçe, çiqa ku carcaran jî radibû ser xwe û av dixwest lê cidayî wê bêdeng disekinî. Dema em ji Meranos verêketin, wê demê hevaln bi riya Bêtêlê gazî me kirin û ji mere gotin: Pêwîste ku hûn boxaza Ga ji berî ku roj bavêje derbasbikin, lê tişta wan digot jî, pir bê îmkan bû. Bi rastî wê demê ez hîna ciwan bûm jî, hevalê bijîşk hate cem min û ji minre got em çibikin, wê demê tişta hevaln digotî, min jêre vegot û min jêre jî got mecalê me nîne ku em wê boxazê biqulibînin, lê ji milê Ertûşê ve jî dengê çekan dihate me û pevçûn pir giran bi rêvediçûn, di navbera Ertûş û boxaza Ga de jî zêde dûrbûn nebû, ji ber wê yekê pêwîst bû çi bi be em boxazê û ji berî li me bibe roj em derbas bikin. Wê demê ji her milî ve zor û zehmetî li ser hev komdibûn û hevalan nedikarîn bimeşim û ne dikarin xwe li ser pişta hêstiran jî bigrin, ji ber ku birînên wan gelek giranbûn û pêwîstiya wan bi bênvedanê hey e. Ji xwe hevalê ku darbestê hildigrin ji hal





hatine kuştin, lê dema ku dewleta Tirkiya xwe dabê xwiya kirin ku 13 de leşker hatine kuştin ev tê wê demê ku hijmarê windayiyên djmin hînjî zêdeti re.
Ji ber ku heva bi xwe çûne ser zenazê leşkerê kuştî û gelek çek û kelûpelê wan ji ser wan rakirin. Çalakiya me li ser dijmin kirî ne çalakiyekî bi pilan bû, lê belê weke ku dibêjin gerîla divê di her warî de xwedî rihê efrandinêbe ji ber vê yekê me fersendek ji xwe re dît û me ji vê fersendê encamgirt. Lewma hemû çalakî ne birengekî pîlankirî ne henek ji çalakieyn bi pîlan û nexşene lê gelek ji çalakiyan bi fersendan tû bidest têxe û jê encam dig re. Ji ber ku dijmin di nava oparisyonêde bû û me ji vê yekê feyde dît û me pîlanlemeyeke dicî de çêkir û em bi ser dijmin de çûn. Çalakiyekî bi vî rengî pir cihekî xwe yê cuda hebû û karî ku pêşiya pêvejoyê veke û bi xwe re guhertin û veguhertinê nû bîne holê. Ji ber ku çalakiyeke bi vî rengî demxa xwe li pêvejoyê da û di hindirê dijmin de fikrandinê kûr û cuda çêkirin. Ev çalakî mirov dikare bêje rihê fermandarê nemir hevalê Adil didê xwiyakirin û canfidayiya wî ya bê sînor û çiwîna wî ya bê didilî bi ser dijmin de û xwe tim gihandina serkeftinê. Ji ber vê yekê ez bi wesîleya vê çalakiyê, şehîdê bê mirin fermandarê hêja û biromet hevalê Adil jî bibîrtînim û di şexsê wî de hemû şehîdên şoreşê bibîrtînim û bi taybet wan hevalê ku di vê çalakiyê de cihê xwe girtîn û tevlî kerwanê şehîdên azadiyê biwîn bibîrtînim.

Vegotin Gelhat

## GERÎLA Û DEMSAL

Dema Gerîlatî tê gotin bê goman şertên zor û zehmet tê hişê mirov. Bi taybet şert û mercên demsalan(mevsım) li ser tevger û lebata gerîla bandora xwe dike. Her demsalek bi awayekî cuda bandora xwe dike. Yek ji van demsalên ku tevgera Gerîla giran dike ewjî zivistan'e. ji ber ku zivistan'a xwezaya çiyayî dijware. ji ber vê yekê em zivistana disekinîn ûme tevger nedikir heya ku şert û merc kêrhatî dibû. Ango me digot ''zaten em nikarin çalakiya bikin em zivistanê istîrahet bikin heya buhar were''. Dijmin jî li gorî vê rastiyê nêzîkatî dikir û ev yek weke qelsiyeke Gerîla dinirxand. Ji bo ku ev têgeh bişkê û herkes bizane ku Gerîla di her demsalê de dikare tevger û çalakî bike di zivistana sala 1993'1994'ande li herêma Botanê li navçeya Cizîrê warê Mem û Zîn'ê de me çalakiyeke li dar xist. ev çalakî gelek bi wate bu û pêwîstî hebû ku çalakiyeke bi vî awahî di demsala zivistanê de bê pêkanîn. Ji ber ku heya wê demê jî herkesî digot Gerîla nikare çalakiya di serdema zivistanê de bike û dijmin hîç bawer nedikir ku çalakî di vê serdemê de were kirin û Ji bo vê yekê xwe rihet hîs dikir. Bê guman ev





xwestin cihê Nexweşxanê biguherin û bibin cihekî hîn saxlemtir. Li ser vî bingehî me amedekariyên xwe ji bona guhertina Nexweşxanê dikirin, wê demê çiqas ku rîskên şehadeta hevalan jî dibe ku ji ber hereketê çêbibin jî, lê ji bona wê jî me xwe amedekiri bû, di wê navberê de hevalan bi riya bêtêlê xeber verêkirin û gotin: Bile heval bi lez xwe bighînin Cîloyê biçûk, li wê derê hevalekî birîndar heye û pêwîste were xilaskirin, lewma dema ku ev salox gihişte me, wê demê mesela cih guhertina me jî hate rawestandin, heval çûn û ew hevalê birîndar anîne û hatin, dema ew heval gihişte me, em çûne pêşiya hevalan û me alîkariya wan hevalê ku hevalên birîndar tanî kirin, wî hevalî jî pêl mayînekî sedam yê berê kiribû, lewma lingekî wî çûbû, ew heval bi xwe jî bijîşk bû, birîna wî ne pir giran bû, lê taybetmendiyên wî hevalî henekî cudabûn ji yê hevalan, ji ber wê ji mere digt: Min nedin razandin dema ku hûn min emeliyat bikin, ji ber ku binya min lawaze û vê yekê narake, wê demê hevaln jêre gotin: Em çibikin; wî hevalî bi xwe ji hevalanre digot:Kêmek derman bişuxilînin bese, wê gavê hevalan bi ya wî hevalî kirin, lê ji ber ku binya wî hevalî nikarî bû rake, ji xewê şiyar nebû, lê ji milekî din ve jî em mecbûrin ku Nexweşxanê bighorin, çiqa ku wê demê êrîşin pir giran jî dihatin ser Nexweşxanê, lê hevalan û li pey hev ev hemû êrîş dişkandin, lê pêwîst bû em wê derê berdin. Me ji bona Nexweşxanê cihekî nû belîkiri bû, cihê ku emê biçûbanê jê re dibêjin dola Notê, ew cih jî li kêleka ava Şîn bû. Dola Note jî henekî dûr dikeve ji bona me, ji ber wê yekê pêwîst bû em amedekariyên xwe li gorî wê yekê bikin. Li ser vî bingehî me amedekariyên xwe kirin û me hevalê heyî kirin du kom, beşek ji wan ez pêre bûm û hevalê ku nedikarîn bimeşin, me ew li hêstiran siwarkirin û hevalê Egîd û xemgîn, me ew li ser darbestan kirin û koma din jî hemû hevalên ku dikarîn henekî bi xwe bimeşin bûn. Wê demê em ketin meşê, demjimêr derdorê carê êvarî bû, ji ber

hevalê Egîd ji şehadetê rizgar bikin, lê me çiqa hewilda me nekarî em xwînê peydabikin, lê dema ku em xwînê peyda nekin jî wê ew heval şehîd bikeve. Ji bona me rewşekî pir zor bû ku hevalekî bi vî rengî dinava lepê me de û li ber cavê me hemiyan şehîd bikeve û em ji xwer lê temaşe bikin. Bi rastî me ji xwere digot heger em bikaribin vî hevalî ji şehadetê xilasbikin, wê demê emê gelek tiştan qezenc bikin. Ji ber ku hevalan di şer de derbeyên pir mezin li hêzên îxanerkar xistibûn û hêdî îxanetê nedikarî bû xwe bide jiyan kirin. Di vê astê de eger me ev heval jî ji şehadetê xilaskiribane, wê demê ji bona me coş û moralekî pir mezin bû. Bi qasî demjimêrekî me geriya, lê me xwîn peyda nekir, di wê navberê de hate hişê min û min ji hevalan re got: Ka li xwîna min meyzebikin dibe ku xwîna min û ya hevlê Egîd weke hev be. Dema ku bijîşk li xwîna min meyzandin, xwîna min ji bona hemû cûreyên xwînan dibû, min wê gavê heme heme nîv kêlo xwîna xwe da hevalê Egîd, ji ber ku me her tişt dabû ber cavê xwe da ku em wî hevalî ji şehadetê xilasbikin. Bi rastî wê demê pir zor bû ji bo hevalê birîndar, ji bo ku li Nexweşxanê tu teknîkên zêde di destê me de nebûn, ji ber wê yekê, dema ku heval emiliyat dikirin, gelek caran bê benc emiliyat dikirin, lewma dengê nalîn û hewarê wan ji ber êşa birînan dihate guhê me û em jî pê gelek têşiyan. Lê birastî tiştekî pir sosret bû dema ku hevalê Egîd qîr dikir min jêre digot bisekne, wê demê disekinî, ji ber ku em gelekî li cem hev mabûn û me êdî hevdû nasdikir ji milekî ve û ji milê din ve jî, ji ber ku wî dizanî bû ku min xwîna xwe daye wî û min ew ji şehadetê xilaskirî ye.

Lê ji bona hevalê din ev tişt henekî cuda bû û dema dengê wan dibihîst nedisekinî. Bi vî rengî me hevalê Egîd wê demê ji şehadetê xilaskir, lê ji milê din ve jî êrîş li ser êrîşê dewam dikirin bêrawestandin. Ji xwe ji milekî ve weke me di serî de dayî xwiya kirin hêzên îxanetê êrîşî me dikir û ji milekî din ve jî leşkerê tirkan êrîşî me dikirin, ji ber wê yekê hevalan





çalakî ne tenê ji bo ku em derbe li dijmin bidin hat kirin! Sedema xwe ya bingehîn ji bo ku Gerîla di milê teqtîk û teknîk de hê bi hêz bibe û xwe ji milê şêweyê kevnar xelas bike. Ev çalakî bi talîmatê berpirsyarê herêma botanê heval Cemal hate pêkanîn. Wê demê em di bîlûka tevgerî ya heval Adilê Bilikî de bûn. Bi tevlî hêzên Cûdî nêzîkî 300 heval li pişta Gundê Şaxê li jêrî tepê 'Ataturk burnu' ji bo civîna çalakiyê em kom bûn û di heman demê de hêzên Gabarê jî, ji aliyê xwe ve civînê xwe pêk anîn û xwe amede dikirin. Piştî civînê em ketin tevgerê û me çekên xwe amede kirin, weke niha di milê teknîkî de derfetê me nebûn, tenê Bisfîng,Bîksî,qilêş û bombê me hebûn. Hawan,doşqa û qatyuşayê me jî hebûn lê me nedikarî bi kar bînin ji ber ku hakimiyeta me li ser tine bû. Ji bo ku em derbê li avahiyê cenderma û polîsa bixin û agir pê bixin, me serê rokêtê bisfîngê vedikirin û me benzîn dixiste nav de. Piştî ku amadekarî bi dawî bûn her grupekî cihê wê hate diyar kirin, ji bo em bikaribin hevûdû biparêzin hemen hemen deşta cizîrê ji aliyê hevala bi tevahî hat girtin, ji ber ku dijmin hakimiyeta xwe di deştê de heye û dikare rihet bi tang û aracên leşkerî mûdaxelê bike.

Dema ku em birê ketin Melayê gundê Şaxê ji mere got “îşev neçin ewê baran bibare û hûnê di heriyê de bimînin”, mejî got tişt nabe Mela em Gerîla ne û bi salane em di nav van şert û mercan de jiyan dikin, Mela wê demê got “hûn bi kêfa xwene, min ji were got”. Piştî em ketin rê seatek derbas nebû baraneke wisa bariya me nedikarî serê xwe rakin. Ji mecburî me pîlanê xwe paşxist û em vegeriyan cihê xwe. Di dema vegerandinê de em dîsa hatin cem Mela û me got mela te çawa dizanî ku ewê baran bibare, ka hela ji mere bêje, Mela li halê me nihêrî û bi riwekî ken got “ min ji were got lê we bi ya min nekir, ji ber di çokê min de romatîzma heye berî baran bibare ez pê dihesim ”. me got Mele, sibê ewê baran were eceba? Mele got ‘‘ sibê baran nayê hun dikarin

herin''. Roja din em ketin rê û em çûn. Grûpên ku herin kemînê û mayina deynin despêkê çûn cihê xwe girtin. Em nêzîkî 70-80 hevalan me berê xwe da cizîrê û em çûn. Hêdî hêdî me xwe nêzîkî lojmana kir. Lê belê hawîr dorê lojmana tev pejerektor bûn û ji ber ronahiya wan me lojman nedidît. Carekî me dît ku ji aliyê ava mezin ve dengê çeka hat. Em ketin nav gumana û me texmîn kir ku heval ketine kemînê. Piştre me bi rêka Bêtêlê biçûk girêdan bi hevalare pêk anî, gotin hevalê Gabarê ketine kemînê û 3 heval şehîd ketine. Dema ku dixwazin ava mezin derbas bikin keleka xwe ame de dikin di wê demê de dijmin pê dihese û kemînê davêje pêşiya wan. Ji neçarî heval paşde vedigerin. Piştî ku me zanî heval ketine kemînê em neçar man ku zû dest bi çalakiya xwe bikin. Di heman demê de di nava bajêr de milîs jî hatine rêxistin kirin û li benda destpêkirina me bûn. Ji ber ku pîlanê me yê çiwîna zindanê û xelaskirina girtiyan jî hebû, ji bo wê jî meyê ji derve û ji hindir ve êrîş kiriba. Bi despêkirina çalakiyê re me li sengeran xist û em ketin nav lojmena, dema me wan rokêtê ku me benzîn xistibun nav de avêtin, lojmen di nav agir de ma û qîr qîra sûbaya û eskera dihate me. Çekê me bi xwere biribûn ev bûn; 10 bisfîng bi 100 rokêta, 9 bîksî û yê dinjî hemû qilêş çekên sivkbûn. Bi giştî 3 grûpê êrîşê hebûn û her grûpek teqwiya û parastina xwe hebû. Li gorî wê demê ewqas teknîk ne hindik bû. Em ketin nav çeperan û me yek dû yekê radikir. Hevalek navê xwe Hozan ji gundê Nerexê bû, dema ku diçe ser çeperan hayê wî jê tine ye ku serê sengerê girtiyê, lewma bomba xwe davêje mewziyê,wê demê bombe li ser mewziyê diteqe tiştek bi eskera nayê lê belê qîr qîra eyşecika tê, piştî ku hevalê Hozan dengê wan dibhîze fam dike ku serê mewziyê girtiye û diçe bombê di taqê re davêje hindir, di encam de 3 esker û eyşecik jî bi wanre tên kûştin. Ji ber ku berê me li pirejektora bû me hemberî xwe baş nedidît û me hereketê leşkeran baş nedidît, di wê demê de eskerekî çeka bi navê LAW avêt û ji hevalê





bayê bezê xwe gihan de cihê hevalê birîdar, wê demê Nexweşxane li jorî gundê Çemço bû, ji xwe wê demê li herçar hêlê me şer bû û bi hemû leza xwe berdewam dikir, berxwedan û şerekî pir mezin li hemberî îxanetê dihate kirin. Wê çaxê dema ku em gihiştin rex hevalan, ji mere gotin hevalek şehîd ketiye û yê din jî birînda re, dema ku me ew dîtin, hevalê bijîşk li rewşa wan meyzand, wê demê kes ji wan hevalan şehîd neketibû, lê ji ber ku birîna hevalê Egîd giran bû û zêde xwîn widakiri bû û wê demê derfetê hevalan nebû û hevalan ji ber ku tiştek ji van meseleyan fihêmnedikirin, lewma dema ku dengê ji hevalê Egîd dernediket digotin qey şehîd ketiy e. Lê dema ku bijîş lê meyzand wê gavê hîn hevalê Egîd şehîd neketi bû; me rabû bi awayekî lez û bez birînê wî hemû girêdan da ku xwîna diherike heyanî astekî bisekine û bi riya çend dar û şivan û şûtikê me darbestek çêkir û bi vî awayî me hevalê Egîd li ser milan gihan de Nexweşxanê û li gorî rewşa heyî, emeliyatekî jê re hate çêkirin, ew heval bi riya vê emiliyatê ji şehadetê rizgar bû û heyanî demekî dirêj jiyan dikir, weke hûn jî dizanin vexwarina avê ji bona birîndaran nebaşe, lê rojekî ji rojan, hevalê Egîd bi veşartî avê vedixwe, wê demê dîse cihê birîn û emiliyata wî diteqe, dema me ev rewş didît, em pir tirsiyan, ji ber ku çiqa me ji meselê tenduristiyê fihêm jî nedikir, lê bijîşk digot wê heval şehîd bikeve, lê emê şensê xwe yê dawiyê jî biceribînin ji bo ku em heval ji şehadetê rizgar bikin, lê ji bona vê pêwîstî bi xwînê heye. Weke tê zanîn di qadên çiyan de peydakirina xwînê pir zore û ne weke bajarane, di bajaran de henekî rewş cudaye, ji bo wê demê tu bangewaziyakî verêdike, xelik û alem tên û yek ji wan xwîna xwe dide û bi lez ev pirsgirêk tê çareserkirin, lê div ê rewşa heyî de, ji milekî şer û pevçûn û hevalê ku xwînê bidin tu nikarê div ê rewşê de wan peyda bike. Lewra yê ku ji van meseleyan fihêm dike û yê ku fihêm nake, em tev ketin nava tevgerê de, ji bo ku em xwînê peydabikin û

weke her car dixwestin bi riya îxanetê û nûkeriyê careke din me Kurdan berdin hev û bi ser bikevin. Ji ber vê yekê dîse şer gurdibû di navbera me û hêzên îxanetkar de, şerekî pir mezin li ser tevgera me dihate meşandin. Wê demê dijmin bi riya hêzê nûkeran bi ser PKKê de dihat, amac ew bû ku xeta azadiyê ya ku rêber APO pêşxistiye ji holê were hilanîn û careke din rojên reş û tarî bibin serdestê civaka kurd û welatê me Kurdistan.

Ji ber wê yekê mirov dikare bibêje ku şerê 1995'an şerekî bi vî rengî dihate jiyan kirin, wê demê em bi fermanekî derbasî Nexweşxanê bûn, ji bo ku em alîkariyê bidin bijîşkan, ji ber ku birîndar gelek di şerde çêdibûn û pêwîstî bialîkariyê hebû; li ser vî bingehî em derbasî Nexweşxanê bûn. Weke tê zanîn xebatê Nexweşxaneyan li qadên çiya pir zor û zehmet bûn û neweke Nexweşxaneyên bajaran bûn, ji ber ku hemû derfetên xwe tu bi xwe diafirîne û peyda dikî.

Mebesta min ji vê bîranînê ewe ku ez dixwazim li ser jiyana du hevalê ku di vê Nexweşxaneyê ji ber bê imkanî şehîd ketîn û ji bo min weke erkekî bû ku ez li ser jiyana van hevalan binvîsim yan jê vebêjim. Ji ber ku di wê demê de zorahî û zehmetiyê pir zehmet dihatin jiyan kirin.

Yek ji van hevalan, hevalê Egîd bû, ew xwe bi eslê xwe ji Rojhilatê Kurdistanê bû û hevalê din jî hevalê Xemgîn bû, ew jî ji Kurdistana Rojava bû.

Heval Egîd, di rojekî ji wan rojan de, dema ku ew û çend hevaln ji xebatê divegeriyan, wê demê demjimêr yazdeyê nîvro bû û dema ku nêzî gundê Sîda de dibin, di encama pêbextiyekî de dikevin kemîna nûkeran de, wê gave hevalê Egîd bi neh guleyan birîndar dibe, xweş tê bîra min, wê demê demjimêr duzde bû dema hevaln xeber verêkir ji bona me û gotin heval birîndarin, bile heval zû xwe bighînin wan healê birîndar û pêwîste ew heval werin xilaskirin. Wê demê ez û hevalê şehîd Harûn hebûn, em rabûn ser xwe û me bi





Hozan îsabet kir, hevalê Hozan di heman demê de şehîd ket, ji ber ku rokêt li nava wî ketibû û hinavê wî derketibû derve. Di wê demê de Hevalek navê wî Cîhad ji lingê xwe birîndar dibe, me ew Heval gihande saxlemiyê û em hatin ji bo ku em cenazeyê Hevalê Hozan rakin lê belê cenaze parçe parçe bibû, ji ber wê me nekarî em rakin, wê gavê em neçar man ku cenaze bihêlin û me tenê cîhaz û çeka wî rakir. piştre me Hevalê din şandin, dema ku diçin Hevalek rokêta bisfîngê davêje lojmanê lê ji ber pejerektoran ew heval baş nabîne û nikare nîşanê tam bigre, dema ku rokêt ji lojmanê derbas dibe Tangek ji milê din tê û rokêt diçe li Tangê dikeve. dema ku zincîrê wê di nav heriyê de dizîvirî mirov digot qey erdê diçirîne, Hevala nedizanî ku ewê Tang werin. Dema ku rokêt li Tangê ket Tang di nav agir de ma û qîr qîr bi leşkeran diket, hinek ji wan şewitîn û yê din xwe bi zorê xelas kirin. di heman demê de di nav bajêr de jî teqînê despêkir. Ji aliyekî de mayin bi Tanga de diteqiyan û li ser pira cizîrê 2 Tang di Avê de werbûn. Ji aliyekî din ve milîs jî ketibûn tevgerê. Ji aliyekî dengê Tang, Top û fîşekan û ji aliyekî din ve dengê silogan û tilîliyê Gelê Cizîrê ji nav bajêr bilind dibû. Dijmin li hemberî tilîlî û siloganê Gelê Cizîrê tehemul nedikir û berê Topa da nav Gel ji bo dengê Gel bisekinînin, lê belê yek deqê jî deng qût nebû û hê zêdetir dengê xwe radikirin.

Ji ber ku Hevalê hêzên Gabarê nikarîbûn werin desteka me, wê demê dijmin dixwest ku derdora me bigre û me têxe çemberê. Ji bo wê jî Hevala telîmat dan ji bo ku em paşde velişin. Bê guman ev çalakî di nava gel de, gelek bi wate bû û ji aliyê dijmin de hejandinekî mezin da çêkirin. Me isbat kir ku Gerîla di bin her şert û mercan de dikare tevger bike û çalakiyan li darbixe…

Vegotin Roj Herekol

## PEVÇÛNA JIYAN Û MIRINÊ





## HER TIŞT FEDAYÎ AZADIYÊ

Di rastiya civaka Kurd û Kurdistanê de tişta herî nexweş û zor îxanete, ji ber ku weke pêşiyan jî vegotiye: “Kurmê darê nejdarê be fenaya darê nîne”. Lê weke em tev jî dizanin, dîroka me Kurdan tijî îxanete û her îxanetê xwestiye roja gelê Kurd tarî bike. Lwma mirov naxwaze wan serdeman bîne ser ziman; ji ber ku hemû serhildanê Kurdan bi riya îxanetê binketine û dijminê Kurdan her tim bi vê riyê xwestiye navbera Kurdan de xerabike û wan ji hev bela wela bike.
Ji ber wê yekê dema em behsa şerê îxanetê yê 1995’ an dikin wê demê rastiya îxanetê careke din weke zincîre dîmenan têde êşa ku hatî jiyankirin û wendahiyên ku di vî şerî de rûdayîn, yek bi yek tîne bîra me û şûna birînan nû dike û jana wan gurtir dike.
Sal 1995’an bû dema şerê başur bû, wê demê ji her milî ve êrîş dihatin ser bizava rizgariya netewa Kurdisanê PKKê û dijmin ji her milî ve dixwest me ji holê rabike. Ji ber wê

tiştekî ji bilî çadirê nalyon nabînin. Wê gavê leşkeran hemûyan xwe kiribûn di hindirê çadiran de û devê çadiran li ser xwe girtibûn. Heval heme bi Bomba û Qilêşan dikevin nava leşkeran de, yek leşker ji serma persiva hevalan nad e. Heval biqasî bîlûkek leşker di wê derê de tunedikin, di vê navberê de hevalê Yilmsz bi şaşîtî şehîd dikeve. Ji ber ku dinya şev bû û pirtarî bû, ji ber wê yekê dema heval dinava cihê leşkeran de diçûn û dihatin. Di wê navberê de hevalê Yilmaz bi şaşîtî şehîd dikeve. Lewra hevalan ji ber wê yekê nikarîbûn tiştê li ser leşkeran hemûyan bi xwe re bînin. Ji ber wê yekê bi zorbela heval cenazê hevalê Yilmaz digrin saxlemiyê û li gorî hêza xwe 12 de çekan bi xwe re tînin. Piştî ku hevalan xwe gihan de me, civîna çalakiyê hate çêkirin û hemû kêm û kurtiyên di çalakiyê de hatîn jiyankiri hatin nirxandin û hevalê ku çalakî kirîn hatin pîrozkirin.

Vegotin Wedad Amed





Jiyan mirovan fêrî gelek tiştan dike û bi taybet dema ku ev jiyan bi zehmetî, zorahî û hevaltiya xwe bi rê ve biçe û xwe li ser vî bingehî bi rê ve bibe û jiyanê ber bi armencê wê ve bibe.

Lê dema ku ev jiyan jiyan Gerîla be wê demê her tişt cudaye û wata wê gelekî dugohere, ji ber ku jiyana Gerîla jiyanekî tijî coş, heyecan, mecere û efrandinên nû ye û her dem û çax jiyan ji tere bi reng, deng û wateyeke. Ji ber wê yekê jiyana Gerîla mirovan dikşîne hindirê xwe, weke sê koşeya bermoda û li van çiyayan mirov fêrî her tiştê jiyanê dibe û xwe ji nû ve avadike, bi zehmetiyan re jiyan kirin û xwe gihandina wê hevaltiya ku tucaran îxanet û dirûtiya jinanê naprjirîne bi serê xwe ji bo şoreşa gelê Kurd û civaka me serkeftinekî pir mezine, di her warî de. Lewra weke rêber APO jî gotî “ xwe naskirin di serê hemû zanebûna di ye”. Ji ber vê yekê ger mirov hêza xwe nasbike û rastiya dijminê xwe baş têbigihêje wê demê tu hêz nikarin wî mirovî binbêxin û ew kesayetiyekî tim wê di karê xwe de bi serkeftî be û bizanibe çawe û li kîjan demê de dijminê xwe têxe davkê û derbeyên mirinê lêbide.

sal 1995’ an bû em wê demê li qada Amedê bûn, li herêma Dorşînê em diman, di wê demê de me pir siqintiyê erzaqan dikşandin. Ji ber ku dijmin ji her milî ve û birengekî pîlankirî li ser me pêdivên jiyanê qutkiribûn û bi taybet li ser gel şidetekî pir giran dida meşandin, heyanî astekî cihekî weke Qulpê, bi kêloyan pêdiviyê xwarinê dihate belavkirin, yê mejî me tiştek nebû ji ber ku her tiştê me ji nava gel dihat, lê dema me li halê gel dimeyzand pir dilê me li halê gel dişewitî, ji ber ku rewşa gel henekî ji ya me zortirbû û dema te li zarokan dimeyzand hemû ji birça tehemul nedikirin. Ji ber vê yekê em gelek caran vale dizivirîn û gelek gunhê me bi halê wan zarokên bê xwarin dihatin. Ji ber ku me ji xwere digot çawe be em dikarin îdare bikin, lê rewşa gundiyan wê çawe be, ji ber van sedeman me tengasiyên cidî jiyan dikirin,

ji ber ku ev rastiyeke şere dema ku haziriyê te nebin di her warî de tu nikare şer jî bikê, belê ev rewşa kesê welatparêz bû û rewşa kesê ku alîkariya me dikin û pariyê devê xwe didan ji bo havalan. Lê li milê din jî kesê ku nûkerî dikirin û alîkariya dijmin dikirin jî hebûn, ew jî rewşa wan baş bû, ji ber ku dewletê alîkarî dida kesê wisa û mirovê ku bi mere alîkarî dikin mecbûrî nûkeriyê û koletiyê ji wan re bike dikirin, beramberî xweşkirina rewşa wan ya jiyanê.
Ji ber vê yekê halê wan kesê ku alîkariya dijmin dikirin henekî cudabû û di hindirê Qulpê de jiyan dikirin. Li ser vî bingehî me saloxek girt, ango xeberek girt ku wê du qemyon erzaq were Qulpê. Wê demê hêzên me yê şehîd Amed disekinîn weke hêzên wê heremê û hêzên navendê jî li wêderê bûn, li ser vî bingehî haziriyên bingehîn hatin meşandin, riya ku qemyonên erzaq wê têre werin hemû qîre û zifte û hemû jî di bin çavdêriya hêzên leşkerîdey e.
Bi vî awayî hemû hazirî hatin temam kirin û yekîneya ku qemyona erzaq birevînin derket û yekîneya ku kemînê deyne belîbû, cidayî wê henek yekîneyên din yê ku dema heval qemyonê birevînin wê paristina wan bikin ew jî derketin.
Li ser vî temelî erdîngariya wê qadê li gurî parastinê û girtina her texmînan li ber çavan hate girtin. Ji milekî ve me dixwest ku em hem erzaqên xwe bigrin û hem çalakiya xwe bikin, ango me dixwest em du çûkan bi kevirekî bikujin. Yekîneyên hevalan bi rêketin û xwe li nêzî rê veşartin. Dema ku qemyonên erzaq tên, heval qemyonekî ji wan direvînin û wê ji rê dertêxin û berê wê didin gundê Kûyê ew jî gundekî ji gundê Qulpê ye, gundekî nûkeran bû, lê wê çaxê valebû, ji ber ku di dema şerde hatibû valekirin, lê ez bawerim neha tijîkirin e.
Dema ku qemyona erzaq gihişte cem hevalan her hevalekî ji milê xwe ve û bi bayê bezê hemû erzaqê têde valekirin û veşartin. Bêje heme hevalan hemû arvanê di qemyonê de veşartin. Gelk ji arvanê heyî me bi dewaran ew saxlem kir,





lê ji ber ku arvan pir bû yê mayî me ew tinê ji ber çavan windakir. Piştî wê û şûnde dijmin kete nava liv û lebatê. Dijmin hate heyanî wî gundê ku me arvan lê danî, ber bi êvarî bû, li jorî gund buxazek hebû, em çûn û me ji wê boxazê keşfa dijmin dikir, me meyzand ku dijmin wê li gunde agir hilkiriye û wê li hawîrdorê agir kombûne. Me ji hevre got em biçin di gun de li wan bixin, hêjî me guftugoh dikir ka em di kîjan milîve biçin ser dijmin, dinya jî bêje heme, heme tarî dibû, lê me dît ku vaye dijmin bi milê me ve tê. Wê demê me got pir başe; vaye dijmin xwe bi milê me ve tê, wê çaxê me haziriyên xwe kirin ji bo ku dema dijmin berû me were em wê şaxê lêbixin û encam bigrin. Ji ber ku sirtê em tê de henekî dirêj bû û çend boxaz tê de hebûn, me rabû hemû boxazê heyî girtin, ji bo ku dijmin ji kîjan milîve derkeve em lêbixin. Carekî di wê nav berê de dema ku em dikemînê de sekinîbûn me dît dijmin berû me hat, wê gavê hevalan hevalan lêdan, heft leşker ketin erdê, hevalan bi rengekî saxlem xwe bi şûnve kişandin, dinya jî şilîbû û sermayekî tûj dihat weke tîran, hêzê meyê dinjî hemû çûbû geliyê Koviyan û geliyê Koviyan jî cihekî pir dûrî dijmin bû û geliyekî pir kûr bû, em jî birêketin û me xwe gihan de wêderê, di wê navberê de dijmin jî xwe da lûtkeyekî blind û li wê derê bi cih bû. Roja din yekîneyekî ji hevalan derket û ji ber ku dinya pir tarîbû û şilîbû hevalan xwestin bi şêweyekî fedayî û bi dizîkave têkevin nava leşkeran û derbeyekî li wan bidin. Ji ber vê yekê çar heval hatin hazirkirin ji bo vê çalakiyê bikin, hevalê Yilmaz li ser vê yekîneyê çû. Hevalê Yilmaz hevalekî ji Farqînê bû ji gundê Qeremosê bû. Heval birêdikevin ji ber ku dinya şilî û sermabû bi zorê destê hevalan çekê di destê wande digirtin. Heval dema ku bi dizîkave dikevin nava lûtkeyê ku dijmin tê de bi cihbûyî dibin, wê demê heval dibînin ku hemû leşker ketine nava çadiran de. Çadirê leşkeran jî piraniya xwe ji kîsên nalyo bûn, dema heval li derdorê xwe temaşe dikin